


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



15
1987

NAVEROK

Hozanê rapervan Cigerxwin	
û kovara Hawarê	3
Jî Kurdistanê ra "Tirki ya bî video"	7
Riya Azadi gha hejmara 100	8
Jî nav edebiyata Kurdî ya klasiki	10
Helbest	13
Jî zargotina me	14
Nigarên Kurd dî nava efrandinên	
wênekeşê da	16
Serpêhatiya Ksenofon lî Kurdistan	18
Jî nav edebiyata cihanê - A.Strindberg	21
Pêkeni	23
Dî navbera hêzên welatparêz da hevkarî	24
Quncikê zarokan	26
Elfaba Erebi-Latini	28
Jî nav weşanan	30

Sal : 8

Hejmar : 58

Wêneyê li ser rûpelê pêşîn, jî aliyê hunermendê Kurd Selaheddin hatiye çêkirin. Wênekêş jî Kurdistanê Îranê ye.

Dî wêneyê da, jî nîka Kurd jî mufrezeke pêşmerge ra behsa bombebaranên dijmin dîke.

PÎROZNAMA SALA NÛ

Redaksiyona ROJA NÛ sala nû yên xwendevanan, ronakbir, welatperwer û xebatkarên Kurd piroz dîke, jî bo salên nû serketin û serfirazi dîxwaze.

Em hêvidarin ku, wê sala 1987'an bibe sala yekiti û serfiraziya tevgera azadixwaz ya Kurdistan û bibe sala aşiti û pêşketina gelên cihanê.

XWEDI : KOMKAR - Swêd
BERPIRSIYAR : Şeroçê BOTAN
NAVNIŞAN : Döbelngatan 16 B

113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08/ 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen

ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN
ADRESS : Döbelngatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

hozanê rapervan

Cigerxwin û kovara Hawarê

(Destpêka vê nivîsê di hejmara çûyi da hatibû weşandin.)

Dr. Rehber RÊZAN

Cigerxwin bî kûri dere ber vê pîrsê, wê fereh dîke, bî hûri û jî her alida rastiya nişan dîde:

Axa û began destê stem danine ser wan.
Talanker û dîz û keleş û bêser û pane.

Şêxan û melan xîşt û def û xayet û enwar,
Wek gurzê gıran dane mîlan şêrên xwedane.
Kurdan jî kul û derdê evan qîr û emane
Her yek bî hezar rengi dîxun vi mîletê dil
Lê ew bî xwe der bircên belek, xan û serane

Mîletê kurd her tenê maye lî dînê bêserî
Bes yekiti têda nine her eşîrek sed kerî
Rêncberên bêrêberin, dijmin lîser wan tîm siwar
Begler û axa egîtin, dijminên kurdin jî dil. (19)

Gava ev helbest hatiye weşandin di Hawar'êda, jiya Cigerxwin si û heyşt sali bûye, di wî temenida kelên xwîngermiyê û qencîtiyê vedimurîm, mirov bêtîr dîkemîle, helbestvan damezrandî tê naskirîm di wari ramanida, di van çend rêzên jorinda rewşa Kurdistanê a cîvaki û siyasi tê eşkere kirin, di wê demêda kê mî bûn weha rewşenbîr, ku karibîm pergala cîvatê bî şêwaki zanîstî bînasîn û her jî ber wê yekê em dîbîm ku Cigerxwin tovên helbestvaniya şoreşgerî çandîne di mêjûya literatûra kurdî hevdemda û di qonaxa edebî sêhemînda -A em bî vi terzî dînavîn: Cigerxwin dengê zehmetkêşên Kurdistanê û cihanê, helbestvanê întînasîonalîst (1946 - 1984)- geştîr dîbîm û bêtîr berhem dîdîm. Malkên me lî jor nişan dabûn bî sernîvîsa "Derdên Cigerxwin" hatiye nasîn, helbesteka nemûre. Berhemên wê nemûr pîrîn, her lî ber wê bedewkariyê Cigerxwin tîm bî gelê kurdraye di rojên dijwarda û di rojên şahiyanda.

Cigerxwin ne tenê dîtnên felsefî di cîvakêda rast gotîne, ew kamoyekî (behredar, bîlîmet) zanîstî derûnî (nefîsî) mezîne, bî hunerîkî bîlînd derûnîya me kurda dînasîne di helbesta "Serxwebûna mîrîşkan" da.

Eger em zanûbîm ew cûre janîr bî şîrî tê afirandîm lîser zîmanê lawîran bî şêwaki gîştî û amanca wê ya serekin exîlaqî û perwerdeyîye, lê di literatûra her gelekîda tîştîne netewî aşkere dîke. Cigerxwin di "Serxwebûna mîrîşkan" da bî cîwankarî derûna kurdên xweperest dînasîne, ku her yek jî wana dîbêje:

(19)—Hawar, hej. 27, 1941, rûp. 6

Ezım paşa, ezım mir,
Ezım şahê cıhangir.

Tevan go paşa û mir,
Kes nego ez wezir. (20)

Ev helbest heta roja iro jixweraziyên me kurdan diyar dıke, ku her kes dı cıhê xweda dı-bêje: "Ez û ne tu kes; jı bılı mın kes tuneye", bı raya me ev berhema yeke jı navdartırın helbest dı literatûra kurdida. Cigerxwin her hser wê nefesê ji "Serxwebûna mûriyan" dıwısine û pendê nişan dıde ku ta kurd nebın yek tı çarê ji derd û êşên xwera nabinın û dı vê helbestêda mûri dıpeyvın:

Mûri rabûn weke mêr,
Ketın poz û guhên şêr,

Şêrê sar ê qerbelek,
Nava rojê bû kelek.

Mûri tevda bûne yek
Kuştın şêrê çavbelek.

Arikari yekiti
Mûri kırın rûspi. (21)

Jı bı mîjada serekin şayir hin sanahitır dadıkeve nav keç û xortên kurdan, bı ditına Cigerxwin ewna hêviyên paşerojın û "Barê gran liser milê xortane". Ew hawarê lı xortan dıke ku bı hevra bıxebıtın jı bo serxwebûna welêt. (22) Carına jı hozan bı nermi tê kurdan bı xemgini bang wan dıke:

Ey kurdê lı dor şax û çıyan deşt û newalan,
Çawan dıkûji yar û bıran dost û hevalan
Her wextê dıkêşım keser û derd û mitalan. (23)

Cigerxwin me hemûyan agehdar dıke û rastiya mırovayetiye jı mera dubare dıke, ku her mırovek dımure û tenê karên rümetbıhnd dımının:

Dıniya ne hêjaye, emê tev bımrırın.
Jı mırıyanra çı maye jı bı nav. (24)

Cigerxwin xwe muftiyê eşiqê dijmeê û fetwa wi evine, dı wê babetêda çend helbestên nazik em dı kovara Hawarêda dıbinın: "Xanımeke cwan", H, hej. 52, r. 11, "Ez û yar", H, hej. 57, r. 6, "Ya reb", H, hej. 57, r. 4.

Liser rüpelên kovarê Cigerxwin jı lı gel helbestvanên kurd helbestan pêşkêş hev dıkın, derd û kulên xweyeti û gelemperi û huneri jı hevra xeber dıdın, hunrawa "Berdêlık" (25) bı

(20)— Hawar, hej. 20, rûp. 12.

(21)— Hawar, hej. 39, rûp. 9.

(22)— Bınêr, Hawar, "Marşa Keyani", hej. 52, 1943. rûp. 8 û "Pêşkevın", hej. 54, 1943, rûp. 2

(23)— Hawar, hej. 52, 1943, rûp. 4.

(24)— Bınêr Hawar, hej. 24, 1934, rûp. 7.

(25)— Dı diwana yekan da ya Cigerxwin bı sernıwisa "Bersiva Ebdulxalıq Esiri" hatiye çapkirın, bınêr: jêdera bınavkırı, rûp. 97.

kurmanciya jêrin pêşkêşî "Şehbazê ewci fen" hozanê nemir Ebdulxaliq Esiri kuriye (26) û bi xemgini dûrketina "Rêberê wehuya esmani" poblisistê mezî Osman Sebrî dide ber çavên xwendevanan di helbesta "Peyamga Cigerxwin" da. (27)

Cigerxwin di Hawar'êda wek helbestvan xwe bi xwendevanan da nasin, lê wi şoreşgeri bervê qelemê xwe ber çirokan ji dajût, em di kovarêda kurteçiroka "Behramê Gur" dibînin. (28). Bi hunerîki lihevhati nîvisevan şahê Îranê raberî me dike, çawa ew xwina gel dimuje û bajaran kavil dike û ta rewşê baş binasine ew motiva folklorî bi kar tîne.

"Behramê Gur" bi nagelîanên xweva li nêçirê vedigerin di nav bajarekî kavilkurira dehrin. Li wir du kund bi dengîki ziz û bilind liser xuraban dixwinin, diyare aşeba çivikan ji nabe eger jinhênan nebe û vê hevpeyvê dibihîsin:

"Kunda me:

—Ez dil dikim lê biteê gelenê keçên malbeta me girane, ez bawer nakim ku tu karîbî di bîn barê munda rabî.

Ê nêr lê vegerand û got:

—De bêje qelenê te çiye?

A mê:

—Qelenê min çêl bajarên wêranin, da ku em zivîstanê têda bilûsin û biharan liser wan bixwinin.

Ê nêr:

Serê Behramê Gur sax bê; ezê ji niha ta deh mehên din çarsed bajarên wêran bîdime bavê te" (29)

Pîştî bihistina qelenbirina kundan şah Behram hinekê li xwe xerab dibe, hest dike ku çivik ji zordestiyên wi dizanin, lê gava digihne talara xwe disa liser awê berê dehre.

Pêwîste hin bê gotin ku ev berhama nîrxdar her di Hawar'êda hatiye çap kirin û di berhemên Cigerxwin yê çapkirida me nediye. Û li gor daxweza xwediyê Hawarê Cigerxwin di hejmarê 22'da kurteçiroka "Mîr Muhyî" belav dike.

Hin bendeka granbiha ya Cigerxwin di kovarêda hatiye weşandin bi sernivîsa "Hespên xweşxwenên kurdi", ew li batê Behrên Ferahîdi "Hespan" bi kar tîne, ew çar hespan di sêngandina şîrê kurdîda dibîne:

Hespê çeleng — du gavan davêje, her gavekê pênc movik têda hene.

Hespê Laxir — du gavan davêje, her gavekê şeş movik têda hene.

Hespê Sivik — du gavan davêje, her gavekê heft movik têda hene.

Hespê Rewan — du gavan davêje, her gavekê heşt movik têda hene.

Cigerxwin nîmûna ji fomklor û şîrê kurdi raberî xwendevanan dike û hêvî dike ji wan ger kêmasî di wan "Hespan" da hene bila serrast bînin û hin baştir bibe zînin. (30)

Hawarê ji wek organên çapemenî kurdi din girîngiyeke mezî dabû pîrsa yekitiya zîmanê kurdi û li gor ditîna me Cigerxwin raya xwe rast û dirûst gotiye di wê babetêda. (31)

Em bawer dikim ta radeyekê ji xwendevananra aşkere bû çawa bû destpêka helbestvaniya Cigerxwin di Hawar'êda û bi çî terzî hat hawara Hawarê û çî rol list wek helbestvanekî rapervan û dimoqratekî şoreşger. Wi bilîmetî bi zîmanekî gelî sade berhemên xwe dînvîsand ji hemû çînên gelra, ta hemû têbîghînin û pîraniya gel nigara eşên xwe têda dîdîtin, lewîa xwendevanan helbestên hozanê xwe liberkirîne û liberdikin û em karîn bêjin ku Cigerxwin hunermendê

(26)— *Bînêr Hawar*, hej. 10, 1932, rûp. 3.

(27)— *Bînêr Hawar*, hej. 21, 1933, rûp. 2.

(28)— *Ji xwendevanên rêzdarra aşkerîye ku Cigerxwin çiroknîvîse ji, emê li dawîya wê bendê berhemên çapkîrî û destnîvîsên rehmetî nişan bîdin.*

(29)— *Hawar*, hej. 31, 1941, rûp. 6.

(30)— *Bînêr Hawar*, hej. 22, 1933, rûp. 1-3.

(31)— *Di lêgerîna doktorada di rûpelên 81-88 da me liser wê pîrsê bi zîmanê rûsî nivîsiye, niha ew ji amadîye bo weşandinê bi kurdi.*

peyva şoreşgeriye dî literatûra kurdida; Cigerxwîn janûra liriki - pöblisisti damezrand dî literatûra me kurdanda.

Lê Hawarê çî lî Cigerxwîn veğerand?

Kovara Hawarê hunek rûpelên diroka çanda me geş kırım, berhemên pöblisistan û helbestvanan bî gel nasandim û paşê pir jî wana çihên mezin digirin dî mêjûya edebiyata kurdida, eğer Hawar û organên dm Bedirxaniyan /Ronahi, Roja Nû û Stêr/ derneketana mirovê kariba ewqas behredar binasina? —Bê guman na, ne dîr bû me tî kes jî nasnekira û dî vê babetêda mamostê me yê rehmeti profesor Qanatê Kurdo rast nivisiye: "Eğer ew kovar tunebana, nelhatina çapkîrîne, şîr û helbestên Cigerxwîn jî qet çap nedibûn û xelqê kurd pê nedihesiya ku li nav wida hozan û şayirên mezin hene, ku yek jî wana Cigerxwîne" (32). Em karim hin bêjin ku Cigerxwîn bextewartir bû jî helbestvan û nivisevanên Hawarê, jî ber ew berdeyam bû liser dijwartirin rê û tî caran sparde nebû beramber her çûre êş û azara û şopeke mezin hêşt jî hevdemên xwera û jî nêweyên diwaroçra.

BERHEMÊN HELBESTVANÊ MEZIN CIGERXWÎN

- 1— Diwana Yekan, Şam, 1945.
- 2— Cim û Gulperi, (Çirok), 1947.
- 3— Sewra Azadi, Diwana 2, 1954.
- 4— Reşoyê Darê, (Çirok), 1956.
- 5— Gotmê Pêşiya (pend), 1956.
- 6— Awa û Destûra Zîmanê Kurdi, Bexda, 1961.
- 7— Ferhenga Kurdi, 1, Bexda, 1962.
- 8— Ferhenga Kurdi, 2, Bexda, 1962.
- 9— Kime Ez, Diwana 3, Beyrût, 1973.
- 10— Midîya û Salar, (Çirok), Beyrût, 1973.
- 11— Ronak, Diwana 4, Stokholm, 1980.
- 12— Zend-Avîsta, Diwana 5, Stokholm, 1981.
- 13— Şefaq, Diwana 6, Stokholm, 1982.
- 14— Hêvi, Diwana 7, Stokholm, 1983.
- 15— Tarixa Kurdistan 1, Stokholm, 1985.

DESTNIVÎSÊN SEYDAYÊ MEZIN CIGERXWÎN

Liser daxweza me birayê rêzdar Azad Cigerxwîn roja 27.12.1985 namak jî mera şand û bernavên van destnivîsan têda bûn:

- 1— Diwana 8.
- 2— Diwana 9.
- 3— Tarixa Kurdistan, bergên 2, 3, 4.
- 4— Awa û Destûra Zîmanê Kurdi, (nûkiriye).
- 5— Ferhenga Kurmanci, bergên 1, 2. (nûkiriye).
- 6— Folklorê Kurdi, bergên 1, 2, 3.
- 7— Çiroka Jindariya Mîm, berfên 1, 2, 3.
- 8— Hozan û Navdarên Kurdistan.
- 9— Şerha Diwana Ciziri.
- 10— Şerha Dîbaca Xani.
- 11— Hespên Rîstvanên Kurdistanê.
- 12— Gotmên Pêşiyên, bergên 1, 2. (nûkiriye).
- 13— Hesenê Mûsê, (Çirok).

(32)— Qanatê Kurdo, pêşgotina "Zend-Avîsta" Cigerxwîn, Diwana 5'a, rûp. 12.

- 14— Kuştina Xorteki Îrani Lî Berlinê (wergerandin).
- 15— Kurd, Minorski, (wergerandin).
- 16— Dewleta Mehabad, (wergerandin).
- 17— Tarixa Mala Şedad, (wergerandin).
- 18— Tarixa Kurda Lî Yemenê, (wergerandin).
- 19— Kurd û Kurdistan, Nikitin, (wergerandin).
- 20— Çiroka Şofê Kamyona Sor.
- 21— Çiroka Xecê û Siyamend.
- 22— Tarixa Şoreşa Kurdîstana Iraqê, (hatiye hunda kirin).
- 23— Rapora Mîfetêşê Umûmî Lî Tirkîyê.

Em bî dilgermi spasi parêzer Azad Cigerxwin dîkin, ku em şad kirin bî hebûna vê gencina nûrxin; bê guman ewê rojekê jî çapê bî derkevin.

JI KURDÎSTANÊ RA "TIRKÎYA BÎ VIDEO"

Nivîs ji RÎYA AZADÎ (hej. 99) hatiye wergerandin.

Wezirê Perwerdegari ya Milli ya rejîma kolonyalist-faşîst M. Emîroxlû weha dibêje: "Ji bo destpêkirina perwerdegariya bî video, haziriya me heye. Dî vê xebatê da emê vê heqê ewil bîdîm bajarên "doxû" yê. Wê kasetên videoyê zêtir bî Tirkî û Îngilîzî be."

Tîştêk balkêş e ne wisa? Heta niha tenê ji alî zordari, eşkence, çêkirina qereqol û qîşlan, sazûkirina girtigehan da dora yekem didan "doxû" yê, angî bî navê xwe ya rastî Kurdistan, ku kolonyalîstan nedixwest vi navî bîdîm serzar û zîmanê xwe. Dî Kurdistanê da iro jî bî hezaran cigehên ciwarbûyîne bê dibîstan m. Bî sedhezaran zarok xwediyê îmkane çûndina dibîstanê û xwendin û nivîsandinê nin. Lî merkeza Diyarbêkir jî, jî ber sedemên tunebûna dibîstan û mamostayan 26 hezar zarok nîkarin herin dibîstana ewil. Îca niha çî bûye ku Baqan efendî pêşengiya perwerdegari ya bî video, hum jî "bî Tirkî-Îngilîzî" dîde "şerqê?" Lî kijan çiyayî gur mur? Tu divê gelo siyaseta rejîma kolonyalist ya lî hember gelê

me guhuri!

Aşkeraye ku ne h çîya û bajarên gur mirîne ne jî siyaseta rejîma zordar lî hember gelê me guhuriye. Gelo wê rejîma kolonyalist van gotmên xwe bî ci binin yan neyin; wê bîkarîbîm bî şandina çend videoyan jî navçê ra xwe bîewîqînin yan na, ev babetek dîn e; lê nasandina vê kiryarê û armanca wê ne zehmete. Ev jî parçeyek jî şerê ku dî Kurdistanê da tê ajotin e. Ev siyaset, berdewama siyaseta helandina Kurdan e. Tevî dek û dolavên wan jî, heta iro ew Kurdên ku bî rik nexwestine zîmanê xwe jî bir bîkî, belkî jî bî cazîba videoyê bîxapî!


Diyarkirina perwerdegari ya bî video ya "xasîma Tirkî û Îngilîzî" jî balkêş e. Wê bî Kurdî nin be elbet; lewra Kurdî jî Kurdan ra qedexe ye. Ji van zîmanên biyanî me Tirkî fêmkur, ew zîmanê kolonyalîstan e, em mecbûr mî hinbîm! Îca hûnê bêjin ev Îngilîzî jî kêderê derket? Ew jî zîmanê efendiyên me yê şîrik, zîmanê Emrikaniyan e. Sîstema perwerdegariya me Emrikani; sinema me, televîzyona

me Emrikani; serokwezîrê me yê qîcîk jî malek Emrikani... Wextê rewş wîsa be, divê zîmanê me jî Emrikani nin be? Mezinê me baş fikirîne, bîla bîjin!

Eger hûn rastiyê bîxwazîm, evya bî kêrî gelê kurd jî tê; eger mîrov hîni zîmanek bîbe, divê zîmanekî ku dî dîne da hukmê wî hebe, zîmanê Îngilîzî hîni bîbe.

Dîbe ku sibê, dî şunda ku Emrikani usûlên eşkence hîni polês û MÎT'ên Tîrka bîkî, ew bî xwe vî kari pêk binin. Wê gavê jî zîmanê Îngilîzî wê bî kêrî gundiyên Kurdan bê; jîhev fêmkîrîn wê hêsa bîbe. Gava mîrovên me lêdanê bîxwîn, wê dî şunda "elîne sagîlk" da "long live America!" bî qîrîn..

Rejîma kolonyalist ya ku şaş maye 15 mîlyon Kurd dî kêderê ke, bî van kiryarên xwe roj bî roj ruswa dîbe. Heta iro lî dîjî gelê me perwerdegariya bî cop, bî lêdan, bî dardakîrîn û qîrkîrîne gelek rê hatîm ceribandîm, lê bî vê hawê tîştêk bî dest nexîstîm. Îca bîla carekî jî bî video bîcerîbînin...



riya azadi

GIHA HEJMARA 100

Organa Partiya Sosyalist a Kurdistanê Tırkiyê, RİYA AZADİ, dı destpêka sala 1987 da giha 100 hejmarî. Ev riya ku hatiye stendın, bo kovareke mehi gelek dirêj e û hêja ye. Xosima, bo kovareke ku bî destê şoreşgerên Kurd tê derxistin, himber ewqas zordesti û zulm û dî rewşên giran da.

Hejmara pêşin a Riya azadi, bî navê ÖZGÜRLÜK YOLU dî hizêrana sala 1975 da derket. wê bî mêrani, pîrsa Kurdan û Kurdistanê, zulm û zordestiya hêzên biyani lî ser gelê me eşkere kir, riya xilasbûnê jî gel ra nişan da.

Riya Azadi ji zman û çanda Kurdi ra jî xizmetek hêja kir. Jî hejmarê heftan dest pê kir, bî Kurdi jî nivisand. Beşek jî rûpelên xwe kir para zman û çanda Kurdi.

Bona vê yekê em dixwazın, bî kurti be jî lî ser lî ser Riya Azadi bisekinın, rol û xizmeta wê dî tevgera welatparêz û şoreşger da çî ye, bîdın ber çavan.

Xuyaye ku Riya Azadi organa partiyeke ye û beri hertîştî weşaneke siyasi ye. Wê jî hejmara pêşin dest pê kir, pîrs û problemên gel û welat eşkere kir: Gelê me û welatê me çî halî da ye? Dezgeyê abori û civaki lî Kurdistanê bî çî rengi ye? Zordesti û kedxwariya biyaniyan lî ser gelê me çawa pêk tê? Gelê Kurd çawa dikare xwe rızgar bike? Rê û olaxên, haletên têkoşinê çî ne?

Dî Riya Azadi da gelek bendên dirêj derketin lî ser van pîrsan. Ewana bî

awayeki zanîsti dan xuyakırın ku Kurd jî mîletek in. Xudan welat in, xudan zman, çand û dirokeke kevn in. Lê welatê me bî destê imperyalistan û hevkarên wan û bî darê zorê hatiye parçekırın, gelê me ketiye bin destan. Biyaniyên ku welatê me dagirtine, hemû heyiyan me yê ser erdê û bin erdê dikışın, dibın; gelê me xızan dikın. Serhıldanên gelê me bî ağır û şewatê dipelixinın, lî ser me zulm û zordestiyek bê perwa dajon. Heya zmanê me qedexe dikın, cehd dikın diroka me veşerın, çanda me wînda bıkın.

Riya Azadi da xuyakırın ku, ew kedxwari û zordestiya biyaniyan lî ser gelê me, kırın û pêvendiyên kolonyali bî xwe ne. Zulm û zêrandina lî ser Kurdan lî kêm koloniyên tê ditın.

Riya Azadi bî şîweyeke nu lî pîrsa Kurdi nihêri. Bir û baweriyên sosyalizma ilmi jî xwe ra kır rêber, dî ronahiya wan da lî bingeh û sedemên rewşa abori û civaki geri, ew dan ber çavan. Wê, ne tenê zordesti û zêrandina biyaniyan, her usa jî, xırabi û kedxwariyên kevnepêrestên Kurd, ên şêx, axa û miran jî eşkere kir. Dost û dijminê gel jî hev cuda kırın. Daxwaz û mafê karker û cotkaran ra xudi derket. Bir û baweriyên sosyalizmê bî xurti belav kir. Bo hişyar kırın û rêz kırına xebatkaran xebiti. Da xuya kırın ku dî şerê azadiyê da hêzên bingehin ev in. Bî yekiti û xebata wan

em dikarin zordestan ji welat bavên,
Kurdistanê rızgar bıkin, zulm û
zêrandinê ji bini paqış bıkin, sazûmana
sosyalistiyê, angoyê vekhevi û aşitiyê
ava bıkin.

Riya Azadi da xuya kîrin ku, bo
şikandina bandûra biyaniyan li ser gelê
Kurd, bo ava kirina civatek azad û
dêmkokrat (di gavê pêşin da) divê
hêzên şoreşger û welatparêz di nav
xwe da yekitiyê pêk binin (wek
cepheyeke netewî), her usa ji hevaltî û
piştgiriyek xurt pêk binin bi gelên
cinar ra, dest bidin hev şer bıkin, da
ku ew bîkarîbîna zora imperyalî û
kolonyalîyê, zora faşî û kevneperestiyê
bînin.

Ev dengê nu bû, rêçek nu bû bo
tevgera gelê me li Kurdistanê Tirkîyê.
Dengê sosyalîstan bû, ya karker û
gundiyan Kurdistanê bû. Ev deng di
nav xwendekar û birewerên Kurd da,
di nav karker, cotkar û zanên Kurd da
bi lez belav bû, rû û can girt.

Riya Azadi di warê zman, çand û
dîrokê da ji bi xurtî şerê dijmin kir û
ji gelê me ra xizmetek hêja pêk ani.

Sazûmana zordest bi salan rê ne da
ku zmanê Kurdi bê nivisandin, kitêb û
rojnameyên Kurdi çap bin. Merivên ku
xwendin û nivisandina Kurdi dîzani
bûn qasî tiliyên du destan bûn.
Sazûmana zordest propagandeyek xurt
ajotî bû û kîrî bû serê gelek kesan ku
Kurdi ne zman e, dirokek Kurdan ji
tune.

Di salên 1960'î da 3-4 hew kitêb
derketî bûn li ser zman û diroka
Kurdi. Wek Brîna Reş (Musa Anter),
Elifba (M. Emin Bozarslan), Mem û Zîn,
Şerefname (bi wergera M. Emin
Bozarslan), Gramera Kurdi (Kemal
Badîlî). Ew xebatên hêja bûn.

Riya Azadi ji sala 1975, hejmarê 7'an
dest pê kir bi Kurdi nivisand, gelek
efrandînan nivîskarên Kurd yê berê û
nu xîste ber çavan. Di weşanên Riya
Azadi da kitêb derketin li ser dirok,
zman û edeba Kurdi.

Di Riya Azadi û Roja Welat da gelek
bend derketin li ser hozanên me yê bi
nav û deng Eli Herîrî, Melayê Cizirî,
Feyyî Teyran, Ehmedê Xanî,
Cigerxwîn û yê din. Efrandînan Ereb
Şemo, Qanate Kurdo, Heciyê Cîndî,
Emînê Evdal, Îsmailê Dûko, Eskerê

Boyik, Tevfiq Wehbi û yê gelekên din
di rûpelên Riya Azadi da ci girtin.

Weşanxana Riya Azadi ew kitêbên
jêrin çap kirin:

* Kurd (Kürtler), B. Nikitin (bi
Tirkî)

* Rêzman, (Kamran Bedîrxan)

* Şivanê Kurd, Ereb Şemo (Kurdi û
Tirkî)

* Memê Alan, R. Lescot, (Kurdi û
Tirkî)

* Kulîkên Çiya, Eskerê Boyik
(Kurdi û Tirkî)

* Gora Dîtinên Gerokên Ewrûpi,
Kurd û Kurdistan (Tirkî)

* Pîrsa Netewî û Li Rojhilat
(Kurdistanê) Fêodali û Eşîrî, Kemal
Burkay (Tirkî)

* Kurdistan Çawa Bû Kolonî û
Serhildanên Kurdan, Kemal Burkay
(Tirkî)

* Li Kurdistanê Tirkîyê Sazûmana
Aborî û Civakî, A. Taş (Tirkî)

Bi vi awayî, di pûçkirina
propagandeyê dijmin li ser Kurdên
Tirkîyê da para Riya Azadi parekî
gelek granbuha ye. Di saya vê xebatê
da bi hezaran xort û xebatkarên Kurd
hîni xwendin û nivisandina zmanê xwe
bûn, derheqa dirok û çanda xwe da
hesiyan.

Ew xebat di bin êrişê dijmin da hat
nişandan. Hukma zordest a Tirkîyê
gelek cehd kir ku rê li çap kirin û
belav kirina Riya Azadi û kitêbên wê
bigre. Piştî sala 1979 ji ew bi tevayî
qedex kir. Riya Azadi piştî du sal û
nivan, vê carê bi navê xwe yê Kurdi û
bi şiklê ku derket. Îro bi tevayî giha
100 hejmarî.

Ev bûyereke girîng e, ne tenê bo
Partiya Sosyalîst a Kurdistanê Tirkîyê
(PSKT), her usa ji bo hamû hêzên
şoreşger û pêşverûyan welatê me.

Em xebatkarên ROJA NÛ, ji
serketina RIYA AZADI dîlşa dibin, jê
ra hin jiyaneke dirêj û kar û xebatên
xurt dixwazin.

Riya Azadi, iro ji di vê rê da bê
westan şerê xwe dimeşîne. Rê dirêj e,
berjêr û berjor e. Lê carê ronahi
pêketiyê, bir û baweriyên şoreşgerî di
nav karker û xebatkarên Kurdistanê
da bîngeh girtiye, bejn û bal daye.

Şik tune ku, zû an dereng emê
welatê xwe rızgar bıkin, civateke azad
û pêşketî ava bıkin. □



EHMEDÊ XANÎ

(1652–1707)



A. NÛBAR

JÛYANA EHMEDÊ XANÎ

Ehmedê Xani, di nav hozanên edebiyata kurdi ya klasiki da, navê heri mezin û bi rûmet e. Wi bi efrandinên xwe yê giranbîha, edebiyata kurdi ya nivisandî dewlemend û bilind kirîye. Esera wi ya manzûm "Mem û Zîn" di edebiyata kurdi da ciyê sereke digre. Bî vê esera xwe, Ehmedê Xani daye xuyakirîm ku zimanê kurdi ji zimanekî mezin e û bî vî zîmanê jî şakar (şaeser) dikarin bî nivisandin. Mem û Zîn'a wi bî xwe, iro bêgotin wek şakar tê qebûlkirîm. Ew jî bo gelê kurd bûye çavkaniyeke netewî.


Mîrov dikare bêşik bibêje, ku kêrî şair û hozan hene ku wek Ehmedê Xani di nav gelê xwe da hatibîm naskirîm û hezkirîm. Nav û dengê Ehmedê Xani, xwe gihandîye dervayî Kurdistanê jî. Lêger û dirokzanên biyani qimeteke gelek bilind dane Ehmedê Xani û Mem û Zîn'a wî. Wek nîmûne em li vir ci bîdîm gotîrîn antropolog, etnograf û rohlathasê rûsî Bazil Nikitin: "Hemû ev şairên han (Melayê Cizîri, Feqiyê Teyran, Melayê Batê-AN) zeminê derketina hunermendê ku em dikarin wek "Firdewsiyê Kurd" bî nav bikin, hazîrkirîne. Dema me behsa amadekirîna hestê netewî yê kurdi kiribû, me navê Ehmedê Xani bî birîniyê, em vî wesfê han li wî layiq dibînim, jî ber ku pêvajoya (process) amadekirîna ruhê netewî, ciyê xwe yê rastin; bî şrovekirîna helbestî ya bedew, di esera wî da ditiye."

Ehmedê Xani di sala 1652'an da li dorhêla Hekariya (Colemêrgê) hatiye dîmê, di sala 1707'an da li Bazidê mîriye. Di derbarî jiyana wî da agahdariyên gelekî fire tunene. Lê wi bî xwe nivîsiye ku ew di sala 1061'ê hîcrî da (1652 miladi) jî diya xwe bûye û 44 salî bûye Mem û Zîn qedandîye û di 1094'ê hîcrî (1685 miladi) da Nûbar nivîsiye.

Ehmedê Xani, qala jiyana xwe ya şexsî nekiriye lê jiyana gelê kurd ya sedsalên navîn, pêwendiyên siyasî, aborî, civakî û çandî, bî hostatî li ber çavan raxistiye. Eserên wî, jî me ra wisa diyar dikin ku Xani mîrovekî ronakbîr, xwediyê kultureke helbestê ya bilind, alim û zanayekî dûrbîn bûye.

Berî Ehmedê Xani, hozanên wek Eli Herîrî, Mela Ehmedê Batê, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran nîmûneyên edebiyata kurdi dabûn û li Kurdistanê baş dîhatîm naskirîm. Lê edebiyata kurdi, bî derketina Ehmedê Xani ra xwe gihandîye tanga here bilind.

Xani, xwendîna xwe ya dinî li Cizîrê girtiye. Paşê çûye Bazidê û li wir medreseke vekirîye û bûye dersdarê vê medresê. Piştî mirîna wî, şagirtê wî Îsmailê Beyazidî şûna wî girtiye. Ehmedê Xani li nêzîkî vê medresê hatiye binaxkirîm. Ji sedsalan vîrda, gelê me mezêlê Eh-



CIZIRE – Wek piraniya helbestvanên kurdi yê n kevn, E. Xani ji xwendina xwe ya dini li vir girtibû.

medê Xani wek ziyaretgeh qebûl kiriye.

nalism i Mem û Zin av Ehmed-i Xani, Stockholm 1985, rûp. 13).

BERHEMÊN EHMEDE XANI

Hozanê mezin Ehmedê Xani, 3 berhem li dû xwe hiştine. Wi di hemû nivîsên xwe da pêşangi kiriye. Ferhengoka kurdi ya pêşin wi amade kiriye, bi navê NÛBAR (*yan ji Nûbara Bîçûkan*). Disan yekemin car wi destaneke kurdi ya zargotini - çirokdestana Memê Alan-bi ramanên hevçaxi veçêkiriye; bi motivên siyasi, çandi û netewî xemilandiye û ew tevi edebiyata kurdi ya nivîsandi kiriye. Wi navê wê esera xwe daniye Mem û Zin. Berhemeke wi ya din ji Eqida Îmanê ye, ku ji helbestên dini pêk tê.

Mir Celadet Bedirxan (bi imza Herekol Azizan) di kovara Hawarê da (*Bnr. Klasikên me, Hawar hejmar 33*) nivîsiye ku Ehmedê Xani, pirtûkek li ser coğrafyayê nivîsiye. Heta niha ev pirtûk derneketiye meydanê. "Lê eger wi li ser coğrafya û astronomiyê pirtûkek neniwîsandibe ji, dema ku mûrov Mem û Zin'ê dixwîne tédîgîhê ku ew di van babetan da ji gelekî zana bûye." (*Ferhad Shakely, Kurdish natio-*

NÛBAR

NÛBAR Ferhengoka kurdi ya yekemin e. Xani 33 salî bûye dema ev pirtûka dersê nivîsiye. Nûbar ji 14 beşan pêk tê. Nivîskar di destpêka her beşê da, li ser jiyane, dîtin, bir û baweriyên xwe; şîret û pêşniyazên xwe daniye û dîra bi hostatiyeke pedagojîk, bi şeweyekî manzûm (helbestki) peyvên erebî-kurdi, kurdi-erebî li pey hev rêz dîke.

Ehmedê Xani, di destpêka Nûbarê da dibêje ka wi çima ev pirtûk hewce ditiye û nivîsandiye:

*Nê ji bo sahib rewacan
Belki ji bo biçûkê Kurmancan*

*Weki ji Qur'anê xilas bin
Lazim e li sewadê çavnas bin*

Ev çend sed-sal in, ku Nûbar li Kurdistanê, di xwendina medresa dini da wek pirtûka dersê tê xwendin. 25-30 sal berî niha, piraniya

zarokên kurd, Nûbar dîxwendin û gelek caran jiber dîkîrîn. Lê niha, ji ber ku şûna xwendina medresa dini, xwendina bî zîmanên resmi yê welatên kolonyalist girtîye, êdî Nûbar wek berê gelekî nayê xwendin. Lî gel zordestiya kolonyalist û nijadperest; nîvisandina wê bî tipên erebî, sedemeki dîn yê nexwendin û naskirina Nûbarê ye. Nûbar cara yekemî isal bî tipên latîni û erebî bî hevra, li Stokholmê ji aliyê weşanên Roja Nû va hatiye çapkirin.

MEM Û ZIN

Dî vê berhema xwe da, Ehmedê Xani, wek ronakbîreki mezin ê sedsala xwe, gelş û dijwariyên civata kurd, daxwaza gelê kurd ji bo jiyaneke çêtir, bî hostati aniyê zîman. Parvebûna Kurdistanê dî navbera dewleta Romê (Osmani) û dewleta Safavi (Farsi) da; binehevkirin û neyekbûna eşîrên kurdan ku her yekî ji aliyekî li cem van dewletan ci digrîn û wek hêzên tampon li hember hev şerdîkîn; tunebûna mîreki kurdan, hemû ev gelş û kêmasiyên han dî dilê Xani da bûne derd. Lî gor bawerîya wî, eger kurd bîbin yek û padşaki wan hebe, wê çaxê gelê kurd wê ji bîndestiyê rîzgar be, xwendin, nîvisandin, ilm û huner wê pêşkeve.

*Kurmanc ne pîr dî bêkermal in
Emma yetim û bêmeccal in,*

*Filcumle ne cahil û nezan in
Belki sefil û bê xudan in.*

*Ger dê hcbûya me ji Xudanek
'Alî-keremek, letifedane,*

*'Ilm û huner û kemal û iz'an
Şî'r û xezel û kitab û dîwan,*

*Ev cins bîbûya li ba wî me'mûl
Ev neqd bîbûya li ba wî meqbûl,*

*Mîn dê 'clema kelmê mewzûn
'Alî bîkîra li banê gerdûn*

*Binavê ruhê Melê Cizîri
Pê hej bîkîra 'Elî Herîri*

*Keyfek we bîda Feqîhê Teyran
Hetta bî ebed bîmayî heyran.*

Herçend Mem û Zin destan-çirokeke evîni (eşq) be jî, lê Ehmedê Xani ew kîriye behane jî bo ku fîkir û ramana xwe, daxwaz û pêşniyazên xwe bî vê esera edebî dî nav gelê Kurdistanê da belav bike. Û kîriye. Ev 300 sal in ku gelê me jî Ehmedê Xani û berhemên wî hez dîke.

*Da xelik nebêjîtin ku: "Ekrad
Bê me'rifet in, hê esl û binyad*

*Enwa'ê mulet xudan kitêb in,
Kurmanc tenê dî bî hisêb in"*

Îro kes nîkare bîbêje "Ekrad" (Kurd) bê me'rifet û bê binyad in. Dî dirok û edebiyata kurdi da, berhemên E.Xani bî xwe jî bûne çavkaniya serbîlîndî û serfiraziyê. Gelê me, wê vî hozan û welatperwerê xwe yê mezin tucar jî-bîr neke.

Mem û Zin heta niha gelek caran hatiye çapkirin. Lê mîxabin ku kême hatiye wergerandin ser zîmanên biyani.

Mem û Zin cara yekemî dî sala 1917'an û 1919'an da li Îstebolê bî pêşgotina Hemze hatiye çapkirin. Her ew çap dî sala 1947'an da li Helebê û 1954 - 1958'an da (du caran) li Hewlêrê bî pêşgotina Giwî Mukriyani û dîsan dî 1962'an da jî aliyê Kurdologa Sovyeti M.B Rûdenko hatiye çapkirin. Rûdenko bî xwe û profesor Qanatê Kurdo jî vê çapê ra pêşgotin nîvisine. Çapeke dîm jî ji aliyê M.E.Bozarslan dî sala 1968'an da li Îstebolê hatiye çapkirin.

ÇAVKANIYÊN VÊ NIVÎSÊ:

- 1) Herekol Azizan, *Klasikên Me, Hawar, hej. 33*
- 2) Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdi, Stokholm, 1983*
- 3) Kemal Burkay, *Kürdistanın Sömürgeleştirilmesi ve Kürt Ulusal Hareketleri, 1978*
- 4) Bazil Nikitin, *Kürtler, çap 2, 1986*
- 5) Ferhad Shakely, *Kurdisk nationalism i Mem û Zin av Ehmed-i Xani.*
- 6) Ehmedê Xani, Nûbar, Stokholm, 1986
- 7) Ehmedê Xani, *Mem û Zin (wergera M.E. Bozarslan), Îstebol, 1975*

WERIN

Ne ez, ne tu dimini
 rûberê vi dînyayê.
 Dehcaran
 dîkare bîkujê
 atom û notronên wan,
 Ewana ku,
 bî zîkên têr,
 bî rûçîkên zer
 ser zêran rûniştine
 û xwîna sor ketine çavan
 dijwar nine
 dest bavêjine
 bişkokê fuzan,
 û alemê wînda bîkîn
 yekcar
 nişkêvan
 dîvê ez û tu,
 em û hun rawestîn
 ku teb nebe hêlûn
 lî ser jin û mîndal
 pez û mîrişkên me,
 gulê baxçan
 neqelî, jî kokê va
 Ewrên reş û gewr,
 alavên sor û zer
 mîrinê neynîn,
 zarok stû xwar nebin...
 Werin,
 em mecal nedîn
 destê pişîng û kruzan
 jî erd û ezman bîqetîmîn,
 tîrs-xof,
 tatêl û girinê
 jî dîlan derxînin
 ku,
 pêşkevî
 ber bî stêrka sor
 cîmaet serbest
 gel hev serfiraz bîjin.

VAZGAL



DENGBÊJ KEREM Û MEXSÛD BEG

M. ARARAT

Ez carekê jî Wanê têm. Bî serê resullîlah xeleti tune, min çî ditiye, ewê dibêjim, şairim. Ha lî vira makine were, ez sıwar bım, tune. Dera hanê makine, tune. Ez mam peya. Kuro mın go, wallahi ez jî dev behrê têm, tebayiyê behrê wê mın bixwın. Ez işev herme vi gundi, sibê rabım herım.. Wexta bêderan e Hinek kuleş dıkşınım, hınek bêdera dıkın, hınek zeviya dıçımın. Ez çûm, mın pırskir: "O da Mexsûd Begê kijane? ", yeki go: "Eva hane". Ez çûme odê, mın deri vekır, kes tune. Belê, hema jî vi serê diwêr hetani ber deri bar lêxistıne, dane serhev. Kulavê xwe jî hema usa pêçayî dane ber diwêr heta wi seri. Ode vala ye, kes odê da tune. Mın jî kulavek bır-çû lî pışt bara, balgiki xaliçe tiji giha da ber pala xwe. Kula mın jî hema cıxare ye, çay e. Ha wexteki yek were, tune. Ha niha yek were, tune... Wexteki mın nihêri

dengê derê odê hat. Mın dı qula bara da nihêri, yek kete hundır. Haaa eva Mexsûd Bege reisê gund, xweyi yê zeviya... Serê pêxember, ah eva bendekiya wi ye, guhandıra wi erdêra dıkışe, lê hay jî mın nine. Serkek tiji tıtına pûpikiri ye, dıkışine, bastoni lî mıl da ye. Mın nihêri ber bara da tê - dıçe, ez jî pışt bara da me. Çû - hat, çû - hat, bastonê xwe da ber netika xwe, paşıya xwe jî ber xwe avit, go ring. "Hey" go "mın devê kevaniyê g...Kıftê pati " go- "evê kıftê ez dırandım". Deng tê mın. Mın go, herge fışeka xwe teze kır, ezê deng lê kım. Mın di, çû - hat, yeka dın jî kır, ew hê dı ser wi ra bû, mın go:

-ohooo!

-Qureder, oro ew kiye?

-Ez im da !

-Oro, tu kiyi?

-Ez im.

-Kuro, tu lî ku yi?

Mın go:

-Ez pışt bara da nexweş im

-Kuro -go xwe-xwe- ev kurê kerê kiye, ketiye pışt barê mın?

Serê pêxember, wexta nêzik bû, ez ditım, devê wi ricıfi go:

-Ahaylaaa, kurê mın mırî, eva jî Kerem e hatiye. Eva kurê kerê jî ku ra hat. Kerem ?

Mın go:

-Ha !

-Sılameti?

-Ez sılamet im, tu jî sılameti?

-Kerem tu bî xwêdê, te herdu jî bıhistın?

Mın go:

- Welle, yek sak e

Yek mak e

Kerem dıha terkê jî te nake

Dêla xwe zaf ba meke

-Kerem ez qurbana te me, lawo orta mın-te, xwedê-pêxember, mın nede teyiba, ku bêdera mın derket, ezê deh debo nan bıdime te.

Serê tirê pênc debo, dıke deh deboyan. Ê... mın go: "mala te ava be, t a bı xêr jî heye, ya bê xêr jî heye."

Kulavê xwe, ferşê xwe raxıst, me ra hındık (Şamık -R.N) şerjê kır, xwedê kêmasiya tirê nede ha. Me goşt û bırcê xwe xwar. Ez wê şevê cem Mexsûd Begê bûm mêvan, sıbetirê rabûm, mın go: "Ez kingê werım?"

-Roja dehan.

Ez rê ketım, hatme malê, mın go:

-Made bir

Sınka pır

Xwe têxe tir

Go:

-Çıma ?

Mın go:

-Yeki du t kırına, têran bıdırû, ezê herme deynê t ê.

Ew jî şa bû.. Dan û stendıneka karê ye, çıma şa nebe ..

Heyşt rojên mın serast bûn, mane du roj, ez rabûme çûm. Mın lî perê gend bıhist, dengê def û zırnê tê. Mın jî zara pırs kır:

-Kuro çî heye çî tune ye ?

Gotın:

-Welle, dewata Eziza Mexsûd Begê ye, axeler gı tiji odê ne.

"Ê" mın go "baş e da, t a bı çeçel ha." Mın têra xwe dani sıvderê, çûme odê, mın go:

-Selamın - aleykum, geli axelera !

Gotın:

-Aleykum - selam Kerem efendi.

Mın nihêri axelerê Wanê gışt hatıne; Kınıyas Begê Brûki, Ebûbekirê Giravi ye...



—Merheba

—Merheba

Gışta kêfxweşi dan mın. Mexsûd Beg ji lı jorê rûniştiye. Destê xwe daye ber çavê xwe:

—Oro, ew kiye, oro, ew kiye?

Kınyas go:

—Tu nabini, berf bariye, tu dûmane. Kere-mê dengbêj e hatiye.

—Hay-la, -go xwe-xwe- kurê mın mırı, he... Kurê mın mırı... Eva kurê kerê ji ku ra hat...Kerem ?

—Ha !

—Silameti ?

Mın go:

—Bıla tu silamet bi, ez silamet im.

—Kuro, dirêj meke Kerem ! Emanetê te hazır e, dawet gı dızvire, tu bıstire.

Niha, mın du balgi dane serhev, rûniştıme, qırçını bı kılama xıstiye, dıstrê m. Lê heyi carna deftera wi ji dınhêrim. Mın geleki stra, nihêri Mexsûd Beg rabû, destmala xwe dani, bı perê wi wexti pêncşed panot avit, go:

Kınyas Beg ! Keremê mın ê here Wanê, xerçlıxa wi tune..

Kınyas go:

—Kuro, Kerem tê mala me, em gı razi dıkın. Te tu emrê xwe da pêncşed panot nedı-da, tu iro çıma ha merd bûyi ? Orta te - Kerem da işek heyê...

Mexsûd Begê go:

—Na... Qurbana kurê xwe me, Kerem bı aqıl be ha, te dıxapine, emanetê te hazıre.

Gışta pere avıtın, ani kire destê mın, pêra ji destê mın dıquncırine:

—Kerem tu razi yi?

Mın go:

—Tu pezê xwe, eraziye xwe ji bıdi mın, ber çavê mın nagıre. Ez bona emanetê xwe hatıme.

—Kuro, dirêj meke, behsa wıra meke, emanetê kurê mın hazıre. Bıla ew qıza mın sıwar kın, ezê bıdım.

Pey ! Kuro mın fehm kır, ewê rabe bûkê der-xe, paşê ji nade da... Ez çûme sıvderê, mın solê wi dani, go:

—Mexsûd Beg ! Jı derva gazi te dıkın.

—Oro ki ye ?

Mın go:

—Meriv gazi te dıkın.

—Kuro, de rûnê ezê werım.

Mın go:

—Wellahi gazi te dıkın, tê weri, yan ji bê-jım ?

Mın di go:

—Kınyas Beg, izna mın bıdın, evi bina mın teng kırıye. Ez çawa kım, eva hatiye mala mın, dernakeve..

Kınyas go:

—Q..... te heyê, meçe..

Hate sıvderê, mın têr bılınd kır. Mın di go:

—Kuro, eva çıye?

"Pey..." mın go:

—Têra sor

Du t... dıkır bore - bor

Ka nanê Keremê Kor (1)

Wê here Gıresor

—Kuro Kerem ! Tu kurê meriya ni, aqıl be Kerem ! Ezê niha pênc deboya bıdım te, bıla pênc debo ji bısekıne ser bêdereka dın.

Mın go:

—Kuro, te du t... kırme!

—Kuro, were mebêje Kerem ! Mexe qele-balıxi, meçe odê, cımaetê ra mebêje, ezê bıdım.

Ez xwe kaşı odê dıkım, ew mın kaşı der-va dıke. Ez ji mıhkem dıkım, ku genımê xwe bıstınım. Xwedê ser kesi da neyne, belayetek e.. Em çûne ber bêderê, navê kurê wi Dew-rêş e. Niha, bıla meriv bı esil be, aqıl be, çı dıbe, kurê kê dıbe, bıla bıbe..

Selam-aleykum

—Aleykum-selam.

Kurê wi destê xwe da mın. Qutiya xwe da mın, me cıxarek pêça. Mın di bavê wi go:

—Kuro, ca wi têrê bine, deh debo nan (genım) bıde êtim, bıla here !

Kurê wi go:

—Bavo, eva nanê çıye, tu dıdi Kerem?

—Kurê kerê, mın lı Wanê pere jê deyn kırıne.

—Ê..., pekê, hema qe kes tune bû, tu jê deynki, te ji Kerem deyn kırıye? Wırda işek heyê. Kerem rast bêje, wele ezê nan bıdımê, nebêje ez nan nadımê.

"Ça" go Mexsûd Begê:

—Ez nanê xwe bıdımê, bêje ji ?

—Ê..., welle ez nadım...

Mın go:

—Welle, Dewrêş efendi, xwedê tu belayata ser kesi da neyne. Wê rojê belayetek ser bavê te da hatiye, du t... kırıye;

Yek sak e

Yek mak e

Kerem terkê jê nake

Ê niha têrê dagıre

Bavê te yê xwe ragıre

Erê bavo tê bıdi ?

Mın devê kevaniyê g....

Kiftê pati
Eva ji pişt barê me da rati
Me têr dagrt
Beg xwe ragrt.

Mexsûd Beg go:

—Kuro, Dewrêş ?

—Ha !

—Kurê kerê, gê bine, nanê wi bavê ser piştê, bila here... Devê viya nasekine, evê were odê da bêje..

Kurê wi go:

—Ê, welle Kerem were odê da bêje, ezê bîdîm, nebêje, ez nadîm.

—Ça ? Kurê kerê ez nanê xwe bîdîm bêje ji ?

Kurê wi go:

—Ê..., kopek, tu sibi dîki, nivro dîki, qe li derdorê xwe nanhêri!

—Ê, kurê kerê, mîn haj ji çî hebû, mîn çî zanibû!

Niha kurê wi dibê were bêje, mîn kaşî odê dîke, ew ji dî çakêtê mîn da darda bûye, nahêle. Lê ez xwe ber bî gede dîdîm... Kurê wi derê odê vekir, go:

—Kînyas Beg ?

—Çiye ?

—Zani çî heye ?

—Çî heye ?

—Wê rojê bavê mîn du t kîrîne. Kerem pê hesiyaye, niha deh debo nan jê distîne...

Bû pîrçîni, cîmaet ser piştê ketiye, dîkînin. Mexsûd Beg şîkîr jî vê rojê ra dest - piyê te hatîne ber te... Mîn têr barkîr, xwedê va eyane, temami darkîr. Mîn xatîrê xwe jî gîştî xwest, mîn go:

—Mexsûd Beg, xatîrê te!

—He-he, he-he, mîn diya te g.... Mîn devê bavê te g....

Mîn go:

—Maşallah, t....k, ka ki me diya kê g.. he? Ne te deh debo genîm da cîrma t... da!

Serê pêxember, niha ji ez herme Wanê, ez ku lî wir bîm, nayê Wanê... Heta ku ez jî wir neçîm, nayê wan derana... İca niha belayateke, ku hat ser meriya, zor e...

1) Dî şûna genîm da gotiye nan.

2) Çavêki Kerem perdeke spi kîşyaye ser, lema carna jî jê ra dibê n "Keremê Kor".



DI WÊNEYAN DA : " Xezal Temoyan ", " Çiçeka Kurd ", " Herfa Pêşîn " .

NİGARÊN KURD DI NAVA EFRANDINÊN WÊNEKÊŞÊ DA

Gohar Fermanyan wekile-ke sîsleta wênevanên Ermenistana Sovyetê ye. Riya wê ya efrandariyê hela salên 20'an da destpê bûye, wi çaxi zêndinîgariya ermeniyaye sovetîyê pêşda dihat û dighîşt. Bî komek hostên ermeni yê firçê yê bî nav û deng M. Saryan, E.Tadêrosyan, F.Terlemezyan, S.Agacanyan, S.Aramélyan, G.Giürçyan û yê mayin ra tevayî G.Fermanyanê jî keda xwe dikire nava xebata himdanina zêndinîgariya ermeniyaye sovetîyê.

G.Fermanyan, jî wênekêşên ermeniyaye sereye pêşin bû, ku wan sala xwendina nexşingariyê, monûmentalîstiyê dest ani. Ewê sala 1927'a Înstîtûta Leningradê ya bedewtiyê û têknîkayê kuta kiriyê, ya ku serekvanê wê hos-

tê ûrisayî mezin K.Pêtrov-Votkin bû. Piştî destanina xwendina bînd ew vedigere Êrêvanê û bî çalaki destbî efrandariyê dike. Wênekêşa ciwan aliye hemû janrêd wênekêşiyê da hêza xwe ceriband. Şureta wê xasma di janrêd wek dêmkişandinê (portre çekîrîn), grafîkayê, naturmortê kompozîsyonên dîn berbiçav hate kîvşê. Didemêd tebiyetê, gund û bajarên wêneyê jî jî guhdariya wênekêşê der nemane. Ewê di wê derecê da gelek efrandinên delal saz kirine. Lê dêmkişandin di nava efrandariya G.Fermanyanê da ciki berbiçav digre. Ewê dêmên wan meriva bî hostatî kîşandinê, yê ku bî quweta bazûyên xwe ber dezga deranin berdane, naz-nemet saz kirine, bûne saz kirên

jiyana teze, keda xwe kiriyê nava xebata pêşdabîrîn û gulvedana wêneyê meyi mezin.

G.Fermanyanê cêrgek nigarên kurdî jî saz kirine. Ewê, wek gelek wênevanên ermeni ên mayin, bî hîzkîrîn wêneyên dotên kurdî kîşandiyê, ku di wan da kolorîta meletiyê hatiye xweyîkîrîn. Piştî testiqbûna diwana sovetîyê, h Ermenîstanê dergê xêr û xweşiyê usa jî li ber pareke cîvata kurd vebû. Di nava cerga van mecalên mezin da, ku jî aliye Partiya Komunist û hukumeta komarê da dihatine efrandin, bona saz kirina oxaxên kurdî yê kultur-ronakîyê, hîlanîna nexwendîtiyê di nav kurdan da pîrseke ferz bû. Bî vê temayê ra girêdayî wêneya G.Fermanyanê ya "Herfa Pêşîn" gelekî sembolîk e: Çend jinên kurdan di dersxanê da rûniştine, lê dersdara kurd a ciwan li ber texte wana hîni xwendin û nivisandinê dike. Varyantên wêneyên mayin jî hene. Ji wan yek tê naskirîn bî navê "Dotên Kurdan" (etud bona wêneyê "Herfa pêşîn"). Wênekêşê ew di sala 1955'a çekiriyê.

Bî tema kurdî du efrandinên G.Fermanyan yê dîn jî: Demed (qef) "Çiçekî Kurd" (sala 1957'a) bî hewaskarî tene mezekîrîn.

Wênekêşa xweyîşuret çend dêmên dotên kurd yê mayin jî çekirine, ku niha di Fonda RSS Ermenîstanê ye bedewtiya û muzeya Lenînanê da tene xweyîkîrîn.

PRISKÊ MIHOYÎ
(Jî Rojnama Riya Teze)



SERPÊHATIYA

KSENOFON

LI KURDISTAN

 Werger: DILSOZ

Derheqa kok û bineciye Kurdan gelek maqale, nuçe, lêgerin û pirtûk hene. Piraniya van dokumentan ji alî nivîskar, lêgerinvan û nuçevanên biyani hatine nivîsandin û sed heyf û mîxabin, ku gelek jê nehatine wergerandin. Her çiqas çend pirtûk û maqale yên hêja hatibin wergerandin ji, piraniya van materyalên giranbuha di arşiv û pirtûkxanên Tirk, Erebi, Faris û Ewropayîyan da ne. Ji bo zelalkirina diroka Kurdistanê hewcedariyek mezîn bi van dokumentan û wergerandina wan heye.

Ji pirtûkên ku hatine wergerandinê, yek jê ji klasika Ksenofon (bi zimanê Tirkî) ya bi navê ANABASIS —Vegera Deh Hezaran— e. Ev klasîk ya herî kevintirîn e derheqa Kurd û Kurdistanê da. Di vê pirtûkê da, Ksenofon behsa serpêhatiya xwe û sefera Ecem dîke. Ev serpêhati di navbera salên 401–400 (Berya Îsa) da derbas dibe. Ksenofon bi xwe di navbera salên 430–355'an da jiyaye. Di xortaniya xwe da li ber destê filozof Sokrates xwendiyê û bi eslê xwe Yewnani ye.


Pîştî mirina Daryûs, kurê wi yê mezîn Artakserkses dibe qiralê Ecemistanê û li ser text rûdinê. Bîrayê Artakserkses Kuros ji vê bûyerê nerihet dibe û bi gelek awayan dijayetiya

xwe aşkera dîke. Qiral Artakserkses bi vê rewşê dîhese û hanhanka Kuros dîde girtin ji bo ku wi bîkujê. Lê bi saya mehdervaniya diya xwe ji kuştinê tê azadkirin. Ser vê yekê, qiral, wi ji dora xwe dûr dîke û wek wali dîşîne Ene-dolê. Kuros dibe waliyê Isparta'yê, lê, kiriyara bîrayê wi li serê bandoreke mezîn peyda dîke û bi vê kinê ji Ispartayîyan, Yewnaniyan, Ece-man û gelek miletên din, bi zora peran ordiyek dîcivîne. Armanca vê seferê bîdestxistina textê Artakserkses e. Sefer ji Sardes'ê (Manisa) heta Kûnaksayê (Xana Îskenderiyê) ye. Lewra paytexta qiralê Eceman li Kûnaksayê bû. Kuros kar û barê xwe temam dîke û bi ordiyêke mezîn da jê ser bîrayê xwe. Di şerê navbera Kuros û bîrayê wi da ordiya Kuros bîserdîkeve, lê mîxabin, ji ber kuştina Kuros, ordi bê seri dimine û ji hev belav dibin. Ji Eceman hinek derbasi alî qiral dibin, hinek jê dîrevin û dûra Yewnani bi serê xwe diminin. Li ser vê yekê çend aqilmend û qumandarên ordiya Kuros li hev dîcivin û bîrayê didin, ku bi ser welatê Kardûxan da (Kurdistan) bigihîjin qerexê Behra Reş (Karadeniz) û ji wê da bîzvîrîna welatê xwe. Ji van aqilmend û qumandarên ordiya Yewnaniyan yek jê ji, Ksenofon bû.

Ksenofon bi aqilmendiya xwe di nava demek kurt da bala ordiyê û qumandaran dîkşîne û dibe fermandar. Ji bo vegera welatê xwe nîkarin paşva bîzvîrîna, lewra, leşkerê Eceman li dû van in. Dimine rêyek, ku xwe bigihînin Behra Reş û ji wê da bîzvîrîna welatê xwe. Ew rê ji welatê Kardûxan (Kurdistan) derbas dibe. Li pêşiya Yewnaniyan çemê Diclê hebû û çem tî buhurek nedîda wan. Ji ber vê yekê berê xwe didin çiyayên Kardûxan.

Ksenofon serpêhatiya vegerê rojane nivîsiye û parçeyek ji pirtûkê, derheqa Kardûxan û nasandina wan e. Di destpêka parçe ya derheqa Kardûxan da, Ksenofon, wan weha dîde nasîkirin:

"...15. Hêşiran beyan kir, ku navçeyên Başûr li ser rîya Welatê Babil û Mediyê ye, rê li rojhilat dîgihîje Sûsayê û çiyê havîngeha Qiral Ekbatanayê, ji wê da, ku ji çemê bî derbasbûnê dîgihîje Ludiya û İyoniyê û ku li bakûr ji çiyayan bî derbasbûnê mirov dîgihîje welatê Kardûxan. 16. Dîgotim, ku ev gelê han (Kardûx) li çiyayan ciwarbûyî ne, zor şervan in û bi qiral va grêdayî ninin. Hetta dîbêjin, ku berê Qiral (qiralê Eceman) carek 120 hezar leşker şandiyê ser welatê Kardûxan, lê ji wan leş-



keran tı kes paşva nezviriye. Tevi vê yekê ji, Kardûx bı fermanarê destê Satrap ra dı aşitiyê da bûne; dı navbera herdu welatan da pêwendî hebûye." (Anabasis – Vegera Deh Hezaran – Rûp. 108-109)

Dı vê agahdariya Ksenofon da baş tê aşkerakirin, ku Kurd (Kardûx) mîleteki serbixwe û bı tı dewleteki va girêdayî nînbûne. Ya duduya jî, ji 2400 sal vîrda, Kurd, lı ser axa xwe deman mane.

"2. Gava Yewnani ghiştin çiyeki, ku kûrbûn û firehbûna Diclê tı buhurek nedîda û jı ber ku çiyayê Kardûx -ku pit raseri ava Diclê bû- mecal nedîda ku dı qerexên Diclê da bê meşandin, qumandaran biryar dan weki dı ser çiyayan da bimeşin. 3. Hêşiran jı wan ra gotbûn, ku piştî jı çiyayên Kardûx derbasbîbın ger bixwazın dıkarın jı çavkaniya Diclê ya Armeniyayê (Ermenistan) derbasbîbın, na eger bixwazın jı lı dorê dıkarın bızvırin." (Rûp. 110-111)

Piştî tari bı erdê dikeve, Yewnani bı rêdikevın jı bo ku berya banga sibê bigihîjın çiya. Bı banga sibê ra digihîjın çiya. Dı rê da rasti gelek gundan tên û Kardûx bı wan dıhısın.

"8. Ser vê yekê Kardûxan gundan terkan-dın û tevi jın û zarokên xwe revıyan gazên bılind. Gelek xwarinên ku bê stendın, hebû; dı malan da cûre cûre firaqên tunc hebû. Yewnaniyan yek jı wana nestendın, bı dû gundiyan jı neketın. Kardûx dijminên Qıral bûn, jı ber vê yekê, Yewnaniyan xwe bı Kardûxan xweş di-

kır, ku bı dostani jı welatê wan derbasbîbın. 9. Lê herkes xwarinên ku bı dest xistin, bı xwe ra bırın, lewra, xwarın jı wan ra lazım bû. Ger çıqas lı dû Kardûxan bang kırın jı, kesi bersiv neda û tı meyleke aşitiyê nişan nedan. 10. Gava ku Yewnaniyên dumahikê jı gihan gund, êdî tari bı erdê ketibû; lewra rê wisa teng bû, ku hilkışandin û daketina çiya rojek kişandibû. Dı wê navberê da çend Kardûx yên ku lı hev cıvıyan, êrişî rêzên dawî kırın û çend leşkeran kuştın, çend kesan jı bı kevr û tiran birindar kırın. Hejmara wan ne gelek bû. 11. Eger hejmara wan (Kardûx) zêde bûya, dibû ku piraniya ordiyê bihata kuştın. Wê şevê Yewnaniyan lı gundan ordigeheke vekirî vegirtın. (Jı tırşa Kardûxan) Kardûxan jı lı çiyayan jı agr çemberek çekırın û bı wan agran xeber dıdan hev. Bı zereqa tavê ra qumandar lı hev cıvıyan û biryar dan, ku bı xwe ra heri tiştên pêwist, dewarên bar yên heri baş bîbın, yên mayın lı wir bihêlın û esiran serbest berdın." (Rûp. 111-112)

"15. Dotıra rojê bagereke mezın çebû; digel vê yekê gere em berbı pêş biçûna; lewra, xwarın kêm bû. Khirisophos qumandariya pêşengan, Ksenofon jı ya dumahikê dıkar. 16. Êrişek xurt bı ser wan da hate; jı ber ku çiyê wan teng bû, dijminên (Kardûx) ku jı nêzik va dabûn dû wan kevr û tiran lı wan dibarandin, gava ku Yewnaniyan dest bı êrişê dıkarın, mixabın tevgera wan gelek gıran bû. Gava dijmin bı şid êriş dıkar, Ksenofon car bı car xeber di-

şand pêş, ku bisekîm. 17. Khirisohhos, çî wext jê ra bigotana bisekîne, dîsekunî; lê ew roj di şunda seknê da hanhanka dilezand û emr li yên dû xwe dîkir, ku li dû bilezîm." (Rûp. 112)

"Canfedayan (leşkerên Yewnani) di rêyek dîzi da dîghîjm buhurê. Khirisophos ji dîçe ba wan. Lê Ksenofon, ku tevi baran li rîya canfedayan xweyiti dîke, gelek çaran şer dîke (bi Kardûxan ra) û qewetek guring wînda dîke. Bi dijîmîna ra bazari çêdibe." (Rûp. 114)

"Yewnani bi qêrîn êrişê barbaran (Kardûx) dîkî. Ji ber ku barbar hayedar nînbûn, ji ber yekê rê berdîdan û revîyan. Ji wana kêma kes mîrîm, lewra gelek mîrovên çalak bûn." (Rûp. 115)

"27. Carna ji, yên (leşkerên Yewnani) ku hîldîkîşîyan bîlîndayîyan, di vegera serejêr da ji barbaran gelek zîrar dîdîtin; lewra barbar wîsa pêsvîk bûn, ku çîqas ji nêz va bîrevîyan ji, xelas dîbûn. Kardûxan ji tîrkevan û kuçkaniyê pêva tiştêk hîlnedîgirtin. 28. Ji tîrkevaniyê ra hosta bûn. Dirêjayîya kevanên wan qederê çar-pênc lîngan, ya tîrên wan ji qederê sê lîngan dirêjtîr bû. Bi lîngên xwe yên çepê pêli jêra kevanê dîkîrîm, benê kevanê berbî xwe dîkîşandîm û bi wê hawê tîran berdîdan. Tîrên wan, ji mertalan û zîrxan derbas dîbûn. Yewnaniyan tîrên ku Kardûxan davêtin wan, berhevîdîkîrîm, qayîşek li wan grêdîdan û wek harbe* dîxebîtandîm. (rûp. 118)

Ordiya Yewnaniyan piştî heft rojan dîghîjîm sinorê Ermenîstanê û hêja dîkarîm bîna xwe bîdîm.

"Yewnani ew roj ji, li gundên raserî deştî ku çemê Kentrites (Çemê Bota) seranser derbas dîbû, ordîgeheke vekurî vegirtîm; ew çem qederê 200 lîngan firehîya xwe hebû û Armenîyê ji welatê Kardûxan vedîqetand. Ji ber ku Yewnaniyan li wê derê deştê dîtin kefxweş bûn û bîhna xwe dan. Çem ji çîyayê Kardûxan 6-7 stadîon (qonax) dûr bû. 2. Ji ber ku xwarînen Yewnaniyan hebû û ji ber felaketên ku dîtîbûn bîbirdanî, bi kêfxweşîyeke mezm ordîgeheke vekurî vegirtîbûn. Lewra di heft rojên, ku di welatê Kardûxan da buhartîbûn, ji wan rojan ti rojek bê şer derbas nebûbû û felaketên ku hatîbû serê wan, ji yên Qiral û Tissaphernes ji pîr zêdetîr bû. Êdî ji ezabên, ku ji Kardûxan kîşandîbûn, xelas bûbûn; ev ramana xelasiyê wan rehet dîkir û dîbû sedemê bê tîrs xewbîkîn."

Ksenofon û ordîya Yewnaniyan piştî gelek çetînahî û belayan dîghîjm welatê xwe. Di vegere da ji ordîya dehhezaran tenê du hezar kes dîfîlîte. Ksenofon di dawîya serpêhatiya xwe da dirêjahiya rê û gelên ku naskurîye weha di-de naskurîm:

"25. (Welatê Qiral ya ku em jê derbasbûn, waliyên wan evana bûn: Li Lydia'yê Artîames, li Phrygia'yê Artakamas, li Lykaonia'yê û Kappadokia'yê Mithradates, li Kilikîya'yê Syennesis, li Fenîke û Arabia'yê Dernes, li Suriye û Asurê Belesys, li welatê Babil Rhoparas, li Media'yê Arbakas, li welatên Phasian û Hesperitan Tribazos, Kardukh (Kardûx), Khalyb, Kalde, Makron, Kolx û Mossynoikan; Koitan û Tibarenan bi serê xwe otonom in. Ji Paphlagonia'yê ra Korylas, li Bithynia'yê Pharnabazos, Thraki yên Ewropayê ra Seuthes qumandari dîkir. 26. Di çûndîm û vegere da rê bi temamî, dused û panzde rojên meşê hezar û sed û pêncî û pênc (1155) fersenk**, sîh û çar hezar û şeşsed û pêncî stadîon*** e".

Serpêhatiya Ksenofon ya derheqa Kardûxan (kurdan) da ji alî kovara Hawarê ji hatîye wergerandîm. (Hawar, hej. 32, rûp. 4,5,6,7, Herekol Azîzan, sal: 1941)

Di wergera Hawarê û ya me da hîmek ferqî-yên bîçûk hene. Em bawerîm ku ew ferqî ji wergera du zîmanên cuda tê. Me bi xwe ji zîmanê Tîrkî wergerandiye. Wek nîmûne ferqîyek weha ye:

".....Tîrên Kardûxan ko dîketîn destên yewnanan; zolek çerm bi serên wan va grêdîdan û wek yadîgarekê, ew ji xwe re hîltanîn." (Hawar, rûp. 7, hej. 32)

".....Yewnaniyan tîrên ku Kardûxan davêtîn wan, berhevîdîkîrîm, qayîşek li wan grêdîdan û wek harbe dîxebîtandîm." (wergera R. Nû ji pirtûka tîrkî, rûp. 118)

Lê ji van herdu wergeran kîjan rastîrîn e li gor orîjînalê, em nîzandîm. Ji xwe ferqîyeke mezm ji nîne.

TÊBÎNÎ

* Harbe: Du manê xwe heye. 1- Şîşa ku pê lûla tîngê tê paqîjkîrî. 2- Mîzraq a kîn.

** Fersenk: Ji alî Persan (eceman) va wek qonaxên rê hatiye bîkarînan. Fersenkêk 5,5 kilometre ye.

*** Stadîon: Ji alî Yewnaniyan va wek qonaxên rê hatiye bîkarînan. Stadîonek 600 lîng e. Li gor agahdariya pirtûka Ksenofon, Fersenkêk 30 stadîon e.



August Strindberg

August Strindberg (1849–1912) lı bajarê Stokholmê, dı nav malbateke burjüva-bıçûk da hatiye dinê. Wi cêrgek iş ceribandine —mamostatiya xwengeha bilind ya gel, artistı ü rojnamevani kiriye—heta ku niviskari jêra büye meslekê daimi, sê caran zewiciye ü çend caran bı periyo-dên dirêj lı dervayi welat jiya-ye.

Strindberg, wek pêşewayê edebiyata swêdi ya nûjen (modern) nav ü deng daye, wi dı warê navnetewi da ji dengê xwe daye bihistin. Wi, ji sala 1870 heta mirina xwe, xwe tenê daye niviskariyê, qasi 55 eserên wi hene: Roman, piyes, berevokên serpêhatiyan ü nvisên zanisti (ilmi).

Dı nivê dawiya sedsala nozdan da pêşketina industriyê bı xwe ra guhrandinên mezin ani nav cıvata Swêd. Ref-girtinên hêzên çini ü mezinbûna şerê çini xwe gıhandibû tangeke (merhele) bilind. Dı

nava van şertan da, wek endameki çina burjüva-bıçûk, Strindberg, dı navbera radikalizm ü konservatizmê da, ü dı navbera olperestiyê ü ateistiyê da diçü ü dihat. Ew ji fikrên dereke ra vekiri bû. Ji gelek aliyan va bı gelşên (problem) hevdemi ra eleqeder dibû. Darwin, Marks ü gelek almên dın dıxwend. Dı huner ü edebiyatê da lı rêçên nû dıgeriya. Wi, intiba mezin ji mviskarên ewrûpi wek: Dickens, Zola ü Dostojeviski gırt. Dı pirtükên wi da hemü pırs ü gelşên demi, hatine nitirandin. Lê rêçeke wi ya zelal ü sabit tune ye dı berhemên wi da. Dı salên 1890'i da, çima ku lı dıji dêrê nvisibû, lı ser wi dawa hatibû vekirin. Dadgehê ew serbest berda, lê piştı vê bûyerê, ew lı Swêde nema, çü dervayi welat, bı salan lı Elmanyayê ü Fransayê jiya. Lê dı dawiya emrê xwe da disan girani da olperestiyê ü lı aliyê hêzên radikal ci gırt.

Jin, dı cıvata nû da rola jinê, babeteke sereke ye dı piyes roman ü helbestên wi da. Dı vi wari da ji fikreke wi ya sabit tunebû. Carna azadiya jinê diparêze ü carna ji jê nefret dıke.

Aliyê wi yê taybeti ew bû ku, wi zû dınvısi, dramatize dikır ü beri hertıştı wek yekemin niviskarê romana swêdi ya realist xwediyê xezineyeke peyvan ya geleki dewlemend bû. (Gothe 26 hezar, Strindberg, qasi 21000 peyv (kelime) bı kar dıani.) Wi bı çaveki objektiv, her eşiyayek yan ji didemek bı hemü detayên wê dida. Aliyekı wi yê dın ji ew bû ku, heta derketina wi, tu niviskareki swêdi qasi wi babetên munaqaşa ü gotübêjan neajotibû pêş.

Du salan beri mirina wi, dı 63 saliya wi da, ew bı daxuyani ü meşeke mezin hat pirozkirin. Xaniyê ku têda mur niha wek muze, bı navê Muza Strindberg ji xelkê ra vekuriye.

Berhemên Strindberg yê n meşhür:

1- Kurê jinıka xızmetkar, otobiyoğafi

3-Dızewıcın, berevoka Serpêhatiyan.

4-Bınciyên Hemso, roman voka Serpêhatiyan.

5- Bav, Piyes (trajedi).

LI SER NIV PARÇE KAXEZ

August Strindberg

Werger: X. Leczgin

Barê malbarkîrnê yê dawiyê ji çübû, mala xwe ji bîniya bar kiribû; mêreki cıwan, qeytaneke reş ya şîne lı dora fotorê wi alandi, careki disan lı hundirê xani doşbû, çavê xwe gerand, ji bo ka gelo tiştêk jibir kiribû yan na. —Na, tu tiştêk jibir nekiribû, hiç; û ji hundir derbasî sîvderê bû, bîryara xwe dabû, ku hiç lı ser jiyana xwe ya di vi xani da nefikire. Lê belê lı sîvderê lı ba telefonê, kaxezeki niv-par, bî diwar va pit hatibû zelîqandû; û seranser bî destnîvisên (stilên) cuda hatibû dagirtin. Hin destnîvisên qelema hêşin zelal bûn, dihatin xwendin, yê dîm ji bî qelema reş yan ji sor, bî stileke xerab hatibûn nivîsandin. Hertîşt lı ser vi kaxezê bû, hemû ew dirrok û serpehatiyên wi yê du salan, ku di vi xanida jiyabû, hertîştê ku wi dixwest jibir bike, lı ser vi kaxezi nîvisandi bû; demeke dirêj, ji jiyana mîrov lı ser niv parçe kaxez.

Wi ew kaxez ji wir rakir ani xwarê; ew ji wan kaxezên destnîvisên musvede yê zer bû ku wek rengê tavê dibiriqî. Wi ew dani ser pêxirîkê û xwe di ser da xûz kir û gişt xwend. Pêşiyê navê wê hebû: Alice, ev nav, bedewtrîn nav bû ji bo wi wextekê, ji ber ku ev navê dergîstiya wi bû. Û numra 15 11. Wek hejmareke lı ser incilê di dêrê da, xuya dikir. Lı ser nîvisandibû: Banqe. Ev îş û karê wi bû, îşê muqeddes, ku nan, mal û jin dabû wi, bîngê hebûn û jiyana wi. Lê lı ser çixêzek hatibû kîşandû! Vê banqê iflas kiribû û ji ortê rabûbû. Lê ew zû hatibû xelaskirin, derbasî banqeke din kiribûn, piştî zemaneki gelekî kurt, yê ku wi bî bêhîzûrî û bî tirs derbas kiribû.

Wisa dor bî dor lı dî hev dihatin. Dikana gul-firoş, fayton (ku wê demê wek texsiyên niha dixebûtin. -Werger.) Roja nişaniya wi bû, wê çaxê berika wi ji peran tji bû.

Paşê: maxaza mobilya, hostayê kaxezên diwaran: ew hêlinê çêdike. Buroya barkêşiyê: ew ji ji bona malbarkîrnê.

Bilêtxana Operayê 5050. Nû zewicibûn, ew ji ji wan kesan bûn ku rojên yekşemban diçûne operayê. Dema wan a here xweş ku bêdeng rûdîmîştin û xwe di nav xweşî û hîzûrê da didîtin, lı welatên çirokan lı aliye dîm ê ridoyê (perda tiyatroyê, yan ji sinemayê).

Dûra navê mêreki tê, di ser vi navi ra ji çixêzek hatiye kîşandû. Ev hevaleki wi bû, ku di civatê da xwe gihandibû ciyekî hûnêki bilind, lê bê ketin û rabûn nikanibû serfiraziyê bî dest bixe. Û gelek caran mecbûr bû ku lı ciyên dîr seyahet bike. Çi kareki pûç e!

Lı vir tiştêki nû xuya kir, ku ketiye nav jiyana wan. Bî destê berdestiyê (qewraşê) û bî qelema hêşin hatiye nîvisandin: "Xanum" kîjan xanum? Ew! ewa ku bî mantoyê fire, bî rûyê melûl, ku wisa bêdeng dihat û tucar di nav salonê ra derbas nedibû, tenê di riya koridorê ra derbas dibû diçû oda razanê.

Lı bintara navê wê navê doktor L. hebû.

Yekem car e ku navê mîroveke wan lı wir xuya dîke. "Dayê". Xasiya wi ye ev, ya ku herîtim xwe ji wan dîr digirt, nedixwest vê cota nûzewici acîz bike, wê dixwest wan bî tenê bihêle. Lê niha roja tengasiyê bû, bang lı wê ji kiribûn, ji ber ku hewceyi wê bûbûn.

Dûra destnîvisêke bêtewş, bî qelema sor û hêşin destpêdike. Buroya Komîsyonê: berdestiya (qewraşa) malê derketiye yan yeke nû tê tayînkirin. Dermanxane. Hm! dunya lı wi tari bû, lı ber çavên wi reşevê hat! Dikana şîr. Lı vir şîrê bê tuberkoloz tê firotm. Dikana ku baharatan difroşe, qesab û yd. Hemû îşên vê malê êdî bî telefonê tîm helkîrîn; yani bermaliya malê ne lı ciyê xwe ye. Na, pîr muxabîm ew nexweşê navanînan e.

Êdî nedikani rêzên mayîn bîxwîne, mîna ku di deryakî da noq be û di bîmê ava şor da bînhêre. Buroya defînkîrnê ji lı ber çavê wi ket. Qise ji dîke — Yeke mezin û yeke biçûk, angî: tabût. Û di nav parantêzê da nîvisandi bû; ji axê.

Paşê êdî hew nîvis hebû lı ser vi kaxezi! Bî axê dawî anîbû. Û maxwe rasti ji ne wisa ye.

Wi ew kaxez hîlda, ramûsa û xîste berika pê-sîrê.

Di nav du deqîqan da, du salên jiyana xwe disan careke din jiyabû.

Dema derkete derva, ne piştî wi xûz ne ji serê wi di ber da xwar bû. Serda ji serê xwe bilind girtibû, wek mîroveki dîlşa û serbîhnd, çîmkî tiştê herî xweş ji wi ra pêk hatibû. Ew jiyana bî destê çend rebenan ketibû! □

Pêkeni

TEXSI

Çar mrovên gundi rojeki cara yekem lı texsiyeki sıwar dıbin, dıçine bajêr. Rê gelek xırabeye, dı nav newal û ser serê çiyayan ra rê dirêj dibe û dıçe.

Jı ber ku rê lı hın ciyan xweş lı hın ciyan pır nexweş e, şofêr ser hev vitêsê dıgıhurine. Piçûk dıke û mezın dıke. Jı aliki va ji, jı hıkuwetê ra dıde xebera.

Gundi cara yekem ewqas zêde nêzi makina ajotınê dıbin. Car lı rê û car jı lı şofêr dınhêrın, lê dı texsiyê da xwe lı hev quncaftine û bı hev dıgrın. Lı ciki şofêr texsiyê dıde sekinandın. Vedıgere ser rêwiyên xwe, peya dıbe û dıbêje:

—Çend deqqe emê lı vıra bın, eger hın jı dıxwazın, derkevın avek rokın.

Şofêr 5 deqqe paşê dızvıre, tê derê texsiyê vedıke ku rûnê, mêze dıke ku şışika vitêsê lı ser kursiyê wi ye. Bihna şofêr teng dıbe, bı hêrs jı rêwıyan dıpirse:

—Kekê! Vê şışikê ki jı ci derani?

Xorteki jı nav gundiyan pızav lı xwe dıxe û bê xem bersıva şofêr dıde:

—Mın derxıst kekê.

—Kekê! te bo çı derxıst?

—Kekê can, ev çend saete ku tu dıki naki, nıkari vê şışika bıçûk jı ci derxi. Ez gelek qehirim ku şofêreki Kurd dı vi halê daye. Mın jı xwe ra got, ez vê şışikê jı ci derinım û şofêrê bıra jı vê derd û ezabê xılasıkım. Mın baş nekırıye?..

HESÛDİ

Lı gundeki yek kes hebûye ku tu caran xêra ciranên xwe nexwestıye. Timi ne-

yarti û zema wan kırıye. Mal û mılkkê xwe jı wan parastıye û çav berdaye malê wan. Padişahê muntıqê hesûdıya wi kesi bıhistıye. Rojekê bangê wi û cıraneki kırıye û bıriye qonaxa xwe. Paşê gotıye: —Ez dıxwazım alıkariya we bıkıım. Pere, mılkkê û dewar, wun çı bıxwazın ezê bıwedım. Lê belê şerteki mun heyê. Ki jı vana çı bıxwaze, ezê bıdıımê. Lakin jı vi tıştı du qat jı ezê bıdııme hevalê wi. Gora vê yekê bıxwazın.

Hesûd dıfıkırı; eger peran bıxwaze wê hevalê wi du qatan bıstıne, mılkkê bıxwaze disa wer, bıbe dewar bıxwaze, ewji... Vi tıştı hesûd xemgın kır...

Jı ber vê yekê, wi pere û mal nexwest. Pıştı kûr fıkrandınê hesûd daxwaza xwe diyar kır:

—Padişahê mun, ez dıxwazım tu çaveki mun derxi..

Padişah jı ber vê bersivê şaş û metal ma... Go: —Tu, rasti jı hesûdı...

ÇAWA DIBE?

Hitler rojek çenta xwe ya ku ewraqên dızı têda ne, windakırıbû. Hema wê gavê lı şefê SS dıgere, xeberê dıde wi û emır dıde ku çı dıkım, çawa dıkım bıla bıkıım, bıla çentê bıbınım. Jı işê peşkreşı ra, dotıra rojê Hitler çenta xwe lı malê dıbine. Cardın dest davê telefonê û dıbêje:

—Mın çenta xwe dit, hın dıkarın dest jı lêgerinê bıkışınım.

—Çawa dıbe? dıbêje şefê SS'ê. Jı bo çenta te me sıh casûsên ku şıka me jı wan hebû, gırt. Panzde kesan jı lı xwe danın ku çenta te wan dızıye!

Kurdîstana Iraqê:

DI NAVBERA HÊZÊN

WELATPARÊZ DA

HEVKARÎ



DAXUYANÎ YA HEVKARIYÊ

Jî Ali Siyasi:

1) Jî herdu aliyên tî yek jê ne bi serê xwe ne ji bi grûbek din (grûbek sîsiyan) ra wê li dij hev nekevin tewreke siyasi û yekitiyê.

2) Herdu alî jî, ji bo hilweşandina rejîma Baas û pêkhatina daxwaza gelê Kurd û xurtkirina wê têkoşinê wê bîcadin.

3) Di hemû xebatên şoreşa gel da, xasîma jî di dostani û hevkarîya bi hêzên Iraqî ra, wê tevger şirik be.

4) Komîta rêvebirinê ya raserî yekitiyê, ji bo xurtkirina pêwendîyan û çarêlêkirina pîrsgrêkên ku di merheleyên têkoşinê da dertên, bi hindîkayî wê salê du car li hev bicûve.

5) Herdu alî jî, wê ji endam û dilxwazên hevra rûmetê nişandin.

6) Ji bo yekitiya xwendevanên Kurd yê li Ewropa wê xebat bête kirin.

7) Ji bo pêkanîna rêxistinên Kurdîstani û peydakirina eniyek welatparêz ya fireh wê xebat bête kirin.

Jî Ali Eserî:

1) Wê li navçeyên (azadkîrî) ku di kontrola herdu aliyên da ne xebatên siyasi, eskerî, rêxistinî û agahdariyê serbest be û wê herdu alî jî li pêşîya hev astengi dernexin, alîkarîya hev bikin.

2) Alîyên ku herin navçeyên hev wê ji berê va hev agahdar bikin, tedbirên kollektîv bistînin.

3) Herdu alî jî, wê ji bo emeliyatên şirik

Di 7-8'ê Çiriya Paşîn 1986'an da li Tahrane gawek girîng ya yekitiyê hate avêtin. Ev yekîti, di navbera Yekitiya Niştîmanî Kurdistan (YNK) û Partiya Demokratîk a Kurdîstana Iraq (PDK-I) da pêk hat. Li ser navê YNK Celal Talabani û li ser navê PDK-I jî Îdrîs Barzani bîyar dan ku hêzên xwe ji bo hilweşandina rejîma dîktator ya Saddam bîgihînin hev. Pîştî bîyara yekitiyê, komîteyek ji pênc kesan hate hûlbijartin û dîra daxuyaniya yekitiyê hate amadekirin.

Wek tê zanin, herdu rêxistin jî, ji demek dîr û dirêj va diji rejîma dîktator şerek partîzani dajotin û ev şer gihîştibû merheleyek bilind. Lê mîxabin ku di navbera herdu hêzan da, heta demek nêz jî birakuji, propagandayên nebaş û nakokî hebû. Bê şik ev nakokî zerar dîgîhand herdu rêxistin û dijmîn jî ji vîya istifade dikir. Gelê Kurd bi sedsalan jî berhevda-nên dijmîn, birakuji û dijmîniya navbera xwe û nakokiyên navbera hêzên welatparêz kîşandîye. Bi vî yekitiya herdu tevgerên Kurdîstana Iraq, daxwazek girîng ya gelê me pêk tê û li pêşîya hêzên welatparêz rîya hevkarî, yekitiyê ronîtr dibe, dijmîn dixê taya mîrnê.

Girîngiya vî yekitiyê li ber çavan e. Lê daxwaz yê welatparêz, demokrat, pêşverû, ronakbîrên Kurdîstanê ew e, ku ev yekîti xwedi bernameke fireh û hedefên duwarojê be. Di san daxwaza me ew e, ku ev yekîti eniyek netewî peyda bike û pîrsgrêkên navbera herdu rêxistin, şoreşê û avakirina Kurdîstanê helbîke; bi rêxistin û hêzên ku diji rejîma dîktatorî, pêwendiyê xurt bike û ji bo yekitiya wan cad bike.

yên eskeri cadbikin. Evya, wê ji aliki va li her ali dostaniyê xurt bike, yekitiyê qewitir bike, ji ali din ji di duwarojê da ji bo yekitiya hêzên pêşmergeyan ci çêke.

4) Pêşmergeyên kî bixwazin ji aliyeki derbasi aliyek din bibin, eger çekên li ser wan ne yê wan bin, wê bê çek derbasbînin.

5) Herdu ali ji, wê ji heqên hukim û gumrukên hev ra yê navçeyên xwe, heta ku şert û zurûf bikemile wê rûmet nişandin.

6) Ji bo çarelêkirina pîrsgrêkên gel yê nî dadî wê dadgehên (mehkeme) şirik bê sazîrînin.

Ji Ali Propaganda:

1) Herdu ali ji, wê hemû cûre yê propaganda û xebatên agahdarkirinê yê nî diji hev, bîdin sekinandin.

2) Herdu ali ji, wê him ji bo nasandin û fi-rehkirina şertên peymanê, him ji ji bo nasandina daxwaz û têkoşina heq ya gelê Kurd li nav welat û dervayî welat propagandayek kolektîv bikin.

3) Rexneyên ku li hev bikin, wê ne di weşanan da, di cûinên şirik da bête kîrin.

4) Di hêla propaganda ya teknik da, wê hevkarî bête kîrin. □

ŞEVA ÇANDI

YA KURDISTAN



Di 13.12.1986'an da li bajarê Kopenhagê şevêk bi navê "Şeva Çandi ya Kurdistan" ji ali DAN-KOMKAR va hate pêkanin û şev bi şayiyekê mezînin derbas bû.

Berya şevê endam û dilxwazên Dan-Komkarê xebatek hêja kirin, bajarê Kopenhagê û der-dora wê bi afîşên şevê xemilandin. 3000 afîşên Komkarê, bi rojan li diwarên Kopenhagê va daleqandi man. Ji bli viya di Kopenhagê da bi gelek malbatên karker û mihacirên siyasi ra dan û stendin çêbû û ji bo beşdarbûna wan di vê şevê da, xebatek hêja hate domandin.

Bi vê xebata çalak ya endamên Komkarê, di navbera 1400-1500 kes di şevê da beşdarbûn.

Şev bi marşa netewî destpêkir. Piştî Koma Muzik ya AKSA'yê ser navê Komkarê axaftinek bi sê zîmana (Kurdi, Tirki, Danmarki) hate pêşkêşkirin. Di axaftinê da; zulm û tîda ya giran ku li ser gelê Kurd tê ajotin, êşkence, qirkirin û barbariya ordiya kolonyalist hate rûşkirin. Li gel vana bang li karker, pêşverû û demokratên Kurdistanî hate kirin, ku ji bo bi destxistina heqê perwerdegariya zîmanê dayîk, di radyo ya merkezi da heqê programa

Kurdi û ji bo heqên civakî, demokratî di bin baskê Komkarê da kampanyek bê vekirin û ev têkoşin bê xurtkirin.

Di bernama şevê da Koma Folklorê ya Komkarê ji cuda cuda navçeyên Kurdistanê listikan pêşkêşkirin û bi van listikan bala temaşevanan hate kîşandin û ecibandin.

Di şevê da ozanên Kurd Şivan PERWER, Fîrat û Delal ji muzika Kurdi çend nîmûnên xweş pêşkêşkirin. Her ozanê ku derdiket seh-nê û dest bi strana dikir pêra ji temaşevan bi kefxweşî û şayiyek bilind govend digirtin.

Ji bli viya di programa şevê da di derheqa Kurdistanê da dia film hate nişandin. Bi filmên dia'yê ra muzika fon û li ser rewşa gelê Kurdistan û têkoşina wi ya azadiyê helbest hatin xwendin.

Di şevê da xwarinên Kurdi ji hatin amadekirin û firotin, gelek weşan hatin firotin.

Şev bi serfirazi û bi disiplin derbas bû. Di dawiya şevê da gelek kes ger bi telefonan ger bi serdana komelê kefxweşiya xwe nişandan û xebata komelê pîroz kirin.

Bi silavên şoresgerî - Danmark
EBDULLA



ZAROK

VIZÊ Û EVDAL



Demek ji deman rovi û gur bi hevra jiyanêke xweşik diborinin. Hemû kar û barê wan bi rewşek kolektîvî dibê.

Dem payîz e. Hemû cotkar şovan radikîn. Ji cotkaran cotkarek "Ezê sibê disa wan hacêtan bi xwe ra binim, lê qet pêwîst nake, ezê hema wan wan li vir veşêrim" dibêje û hacetên xwe di nav şovê da vedîşêre û berê xwe dîde mal.

Êdi êvar bû, tariyê xwe berdabû ser çiya û baniyan. Wek carên berê dema nêçira gur û rovi bû. Di kûlê da, di navbeyna herduyan gotûbêjek destpê dîke:

ROVÎ –Birayê gur, wek tu ji dizani, kalbûna min destûr nade, ku ez xwe ji ber kûçikên gund xilaskim. Ji bo vê yekê tu ji bo nêçirê berê xwe bide gund, ez ji li van der û doran bigerim. Tu li ser

vê gotinê çî dibêji?

Gur vê pêşniyaza rovi li cih dibîne û herdu dikevin pey nêçirê. Rovi berbî şovan, gur ji berbî gund dimeşin. Rovi bi qayîşa cot vedigere kûlê û gur ji bi zar û zor xwe ji ber kûçikên gund xilas dîke û destvala dizivire.

ROVÎ –Birayê gur, ev qayîş wê rojeki ji me ra lazım be. Û em wê veşêrim, dibêje.

Gur disa li ser gotina rovi deng nake. Û bila gur û rovi li dû nêçira xwe bimeşin, em vegerin ser rewşa cotkar.

Berbang dibe nabe cotkar gainêşan dîde pêşiya xwe û berbî şovan dimeşe. Berê xwe dîde cihê ku hacet lê veşarti ne. Ew cih hatiye kolandin û qayîşa cot ji li şûna xwe nine.

Cotkar xwe bi xwe difikire û dibêje:

–Hebe tune be rovi van îşan dîke; wi qayîşa cotê min birîye.

Û paşkortika xwe dixwirine û kor û poşman berê xwe dide malê. Lî malê jî jina xwe ra destbî serhatiya xwe û rovi dîke. Jînk pê şaş û mat dimine.

Hikayeta rovi bî dilê kerê malê jî naye û dibe zîre zîra kerê. Ker tê zîman û dibêje:

—Heger hûn kodek ceh bîdine mîn, ezê qayîşê binim.

Lî ser vê gotîna kerê, cotkar û jina xwe kûr kûr dîfîkîrîm. Dî dawiyê da: "Em kodek ceh bîdîm kerê, kerê qayîş anî jî xwe anî, heger neanî jî, kerê me cehê me xwariye" dibêjin.

Kodek ceh dîkîm afirê kerê û dibe fire-fîra kerê. Ker têr alîf dixwe û derdikeve derva, raste-rast berê xwe dîde kûla gur û rovi. Tê lî ber derê kûlê xwe vedizeline. Rovi hîşyar dibe û derdikeve derva. Dînhêre ku tîşteki reş û mezîn lî ber kûlê vezeliyaye. Lî ser lîngeki dîzîvîre hundîr û gur hîşyar dîke:

—Bîra, bîra, bîrayê gur, hîşyar bîbe lo!

Gur tevziyan dîde xwe û hîşyar dibe. Rovi disa dibêje:

—Jî tera dibêjim lo! Hela rabe mîn xewnek dît, dî xewna mîn da tîşteki reş û mezîn dî ber mala me da vezeliyaye, ca were em bînhêrîn ka çî ye lo!

Gur û rovi derdîkevîm derva û çavên gur lê dîqelîşîm, vedîgere ser rovi û dibêje: "Xwişkê xwişkê xewna te xewna Û-sîf pêxember e". Û herdu bî hev dîşewîrîn ku kerê çawa kaşî hundîr bîkîm. Wê gavê fikrek tê hîşê rovi, dibêje:

—Bîrayê gur, bîse lo tîşteki ket bîra mîn. Tê bîra te mîn qayîşeke cot anîbû! Were em aliyekê qayîşê bavêjm stûyê te û aliyê dîm jî stûyê kerê, tu kaşke ez jî jî paşiyê alîkariya te bîkîm.

Ev gotînen rovi dîkeve hîşê gur û wîsa jî dîkîm. Ker pahîneki lî rovi dixê û rovi ser û bînê hevdu dibe. Gur jî bî qayîşê ra kaş dîke heta ber derê mala cot-

kar tîne û dibe zîre-zîra kerê.

Cotkar deng lî jîna xwe dîke: "keçê ca here bînhêre ev zîre-zîra kerê me ye jî derva tê". Jîm dîçe jî derva gazi mêrê xwe dîke. Cotkar jî tê dîbine ku aliyekî qayîşê dî stûyê kerê da aliyê dîm jî dî stûyê gur da ye û lî ber derê malê sekînine. Cotkar, qayîşê jî stûyê kerê derdixê û gur tîne hundîr bî stûneki va girêdîde.

Jîm û mêr bî hev dîşewîrîn ka gur çawa bîkîm. Jîna cotkar:

—Em wî bîkujîm.

COTKAR —Keçê wele ez dîzanîm ku hikayeta qayîşa me ne kîrîna gur e. Ev kîrîm kîrîna rovi ye. Tu jî mîn ra kerê bine ez dîzanîm ezê çî pê bîkîm.

JINA COTKAR — Tu wê çîbîki bî kerê?

COTKAR —Mîn jî tera negot ev kîrîm ne kîrîna gur e, ev kîrîm kîrîna rovi ye jîna mîn. Ezê nîha jî nav herdu guhên wî hetanî ser boçîka wî zoleki derxîm, xoy bîkîm û berdîm.

Ev gotînen cotkar dîkeve hîşê jîna wî. Jîna cotkar jêra kêreki tîne û cotkar dest bî zola çermê gur dîke û xoy dîke û berdîde.

Gurê perîşan bî wî halê xwe, xwe dîgîhîne ber kendaleki û dîkeve. Rovi dîhere ser kendal û bî dengeki bîlînd:

—Lo lo evdiyo evdiyo.

Te qet evdiyê mîn neditiyo?

Gur bî van kîrînen rovi geleki dîl bî kul e û fîkîr guhartîye. Bî axînek kûr:

—Lê lê vîzê vîzê

Çavzixelê tewlebazê

Tu vîza dîni

Tu gelek karan

Lî ser evdiyê xwe tîni.

Fîkîrguhartîna gur geleki dereng ma-bû.

SIMO

Berlina Rojava.

NIMÛNE

Ba	(ب) با	Dar	(ا) دار	Aw	(ئا) ئاۋ	Dara	(ا) دارا	A
Xerib	(ب) غەرىب	Cambaz	(ب) جامباز	Bar	(ب) بار	Bab	(ب) باب	B
Renc	(ج) رەنج	Emca	(ج) ئەمجا	Car	(ج) چار	Bac	(ج) باج	C
Kıç	(ج) كىچ	Bêçare	(ج) بېچارە	Çaw	(ج) چاۋ	Maç	(ج) ماچ	Ç
Çend	(د) چەند	Seyda	(د) سەيدا	Dara	(د) دارا	Dad	(د) داد	D
Bane	(د) بانە	berz	(د) بەرز	Eger	(ئە) ئەگەر	--	(ئە)	E
Sê	(ئى) سى	Bêri	(ئى) بېرى	Erê	(ئى) ئىرە	Wê	(ئى) ۋى	Ê
Alif	(غ) ئالف	Kift	(غ) كىفتە	Firoke	(ف) فىرۇكە	Kef	(ف) كەف	F
Mang	(گ) مانگ	Manga	(گ) مانگا	Ga	(گ) گا	Seg	(گ) سەگ	G
Şah	(ھ) شاھ	Dêhat	(ھ) دەھات	Hawar	(ھ) ھاۋار	--	(ھ)	H
Bilh	(ح) بىلح	Rêhan	(ح) رەھان	Hewt	(ح) ھەۋت	Mızrah	(ح) مىزراح	H
--	(ـ)	Bira	(ـ) برا	--	(ـ)	--	(ـ)	I
Si	(ى) سى	Bir	(ى) بىر	İman	(ئى) ئىمان	Wi	(ئى) ۋى	İ
Dirêj	(ز) درىژ	Biji	(ز) بىژى	Jan	(ز) جان	Bej	(ز) بەژ	J
Fênik	(ك) فېنىك	Tıka	(ك) تىكا	Kar	(ك) كار	Pak	(ك) پاك	K
Mil	(ل) مل	Kıldan	(ل) كىلدان	Lêw	(ل) لېۋ	Hel	(ل) ھەل	L
Çil	(ل) چىل	Êlax	(ل) ئەلاخ	Gela	(ل) گەلا	Maļ	(ل) مال	L
Helm	(م) ھەلم	Yılmaz	(م) يىلماز	Mar	(م) مار	Mam	(م) مام	M
Bin	(ن) بىن	Çınar	(ن) چىنار	Nar	(ن) نار	Van	(ن) ۋان	N
Bo	(ۋ) بو	Roj	(ۆ) رۆژ	Of	(ئۆ) ئۆف	Do	(ئۆ) دۆ	O
Tip	(پ) تىپ	Sipi	(پ) سىپى	Par	(پ) پار	Top	(پ) تۆپ	P
Sılq	(ق) سىلق	Şımqar	(ق) شىمقار	Qaz	(ق) قاز	Taq	(ق) تاق	Q
Hewlêr	(ر) ھەۋلىر	Çıra	(ر) چىرا	--	(ر)	şar	(ر) شار	R
Gır	(ر) گىر	Biri	(ر) بىرىن	Reş	(ر) رەش	Kur	(ر) كور	R
Pis	(س) پىس	Nisan	(س) نىسان	Sard	(س) سارد	Kes	(س) كەس	S
Riş	(ش) رىش	Nişan	(ش) نىشان	Şar	(ش) شار	Aş	(ش) ئاش	S
Heşt	(ت) ھەشت	Zıstan	(ت) زىستان	Tal	(ت) تال	Kat	(ت) كات	T
--	(و)	Kurd	(و، ۋ) كورد	Umêd	(ئو) ئومىد	--	(ئو) ۋو	U
Çû	(و، ۋ) چوۋ	Dûr	(و، ۋ) دور	--	(ئوۋ)	--	(ئوۋ، ۋو)	U
Şiv	(غ) شىف	Bive	(غ) بىغە	Vala	(ڤ) ۋالا	Nav	(ڤ) ناۋ	V
Şêwe	(و، ۋ) شېۋە	Xewn	(و، ۋ) خەۋن	Were	(و، ۋ) ۋەرە	Naw	(و، ۋ) ناۋ	W
Şêx	(خ) شېخ	Mixabın	(خ) مىخابىن	Xani	(خ) خانى	Ax	(خ) ئاخ	X
--	(ع)	Bê'ar	(د) بېئار	'Ar	(ع) عار	--	(ع)	'
--	(غ)	Sixar	(غ) سىغار	Ûar	(غ) غار	--	(غ)	X
--	(ب)	Dayik	(ب) دايىك	Yar	(ب) يار	Ney	(ى) نەي	Y
Rêz	(ز) رىژ	Hezar	(ز) ھەزار	Zawa	(ز) زاۋا	Naz	(ز) ناز	Z

JI NAV WEŞANAN



BAZİL NİKİTİN "KÜRTLER"

Pirtûka Bazil Nikitin "Kürtler" (Kurd), ku dî sala 1976'an da li Tirkîyê, ji aliyê Weşanên Riya Azadi, bi zimanê turki hatibû weşandin, sala çûyi (1986) disan hat çapkirin. Vê carê herdu cildên wê bi hevra û disan dî nav Weşanên Riya Azadi da derketin.

Çawa tê zanin ev lêkolîneke sosyolojîk (ciwatzanî) û diroki ye. Dî wî wari da berhemeke girîng e. Dema ku Bazil Nikitin li Îranê weh Konsolosê Rûsyayê dîma, wî li ser binyad, dirok, zîman, harekter, bawerî, folklor û eşîretên kurdan û wd. bi salan lêkolînen fire çêkirîye û ev eser amade kirîye.

EREB ŞEMO "ŞIVANÊ KURD" (Bî zîmanê elmani)

Romana Ereb Şemo "Şivanê Kurd", li Elmanya Rojava, dî nav Weşanên KOMKAR da bi zîmanê elmani derket.

JÎN -Cîldê 3'a

Kovara "Jin" ya ku dî navbera salên 1918-1919'an da li Stenbolê hatiye çapkirin, niha bi amadekariya niwîskarê kurd M.Emin Bozarslan, cîld-cîld ji nûva tê çapkirin. Heta niha 3 cîld derketine.

XELİL MÛRADOV MORIYÊN NENÊ

Ev berevoka serpehatiyên (hikayet) ya Xelil Mûradov ku cara pêşiyê li Eriwanê, bi tipên kirilîk hatibû weşandin, sala çûyi bi tipên latîni ji hate çapkirin. Pirtûk ji aliyê Delîlo Îzoli hatiye wergerandin û ji aliyê KSSE va hatiye çapkirin. Bi wergerandina vê berhema Xelil Mûradov, xwendevanên ku nikarin bi tipên kirilîk bixwinin, mecalê xwendina pirtûkeke serpehatiyên bi zîmanê kurdi bi dest xistine.

M. MEHMÛD BEYAZIDÎ "ADETÊN KURDISTAN"

Ev pirtûka han ku berê ji aliyê Çapxana Wêjeyî ya Rohilatê, li Moskova hatibû çapkirin, sala çûyi (1986) bi tipên latîni li Hollandiyê hat weşandin. Delîlo Îzoli ew wergerandîye ser tipên latîni û daye çapkirin. Rohilatnas û kurdologa Sovyetî M.B.Rûdcenko ji vê pirtûkê ra pêşgotînek niwîsiye.

EM BINIVÎSIN

Li Swêdê bi zîmanê kurdi pirtûkeke dersê ji bo zarokên xwendina pêşîn hat çapkirin. Ev pirtûk, bi pirtûka "Em bixwinin" ra girêdayî hatiye amadekirin. Çawa tê zanin ev pirtûk ji sala çûyi hatibû çapkirin.

FERHAD SHAKELY & SAYID ABDULLA-Y SAMADÎ BERGENS BRIS (Şîney Kosaran)

"Şîney Kosaran", pirtûkeke çirokan e, ji aliyê Ferhad Shakely û Seyid Abdulla-y Samadî va hatiye niwîsin. Têda şeş çirokên ji Kurdistanê ci digrin. Çirok hem bi kurdi hem ji bi swêdi hatine niwîsin. Wêneyên çirokan ji aliyê hunermendê kurd Qerani Cemil ve hatine çêkirin. Pirtûk ji 80 rûpelan pêkê.

Pirtûk li Swed bi alîkariya Înstîtuta Dewletê ya ji bo Agahdariya pirtûkên hindchariyê (SIL) ve hatiye çapkirin û tê belavkirin.



weşanên
ROJA NÛ



Vet. Dr.
M. Nuri Dersimî

HATIRATIM

NÛ DERKETIN!

Vet. Dr. M. NURI DERSIMÎ

HATIRATIM

"Hatiratim" (Serhatiya Mîn), esera Dersimî ya duwemin e. Ev cara pêşin e ku ew tê çapkirin.

Wek ku xwendevan ji dîzanin, di nav ronakbirên kurd da, yê n ku bi xwe tevi serhildan û şerên azadiya gelê kurd bûne û li ser van tevgeran, li ser rewşa wê çaxê nwisine, gelekî kê m in. Dr. Nuri Dersimî yek ji wane, ku li ser serhatiyên xwe û rewşa gelê kurd ya wê demê nwisîye û ji nûşên (neslên) dû xwe ra, agahdariyên diroki hiştiye.

Eser ji 217 rûpelan pêk tê û zîmanê wê tirkî ye.

Ehmedê Xani


NÛBAR

Nûbara hozanê nemir Ehmedê Xani, cara pêşin isal bi tipên latîni (latîni û erebî bi hevra) di nav Weşanên Roja Nû da derket. Çawa xwendevan ji dîzanin, Nûbar ferhenga kurdi ya here kevî c. Nûbar herweha pirtûka dersê ye. Xani ew di sala 1685'an da nwisîye. Xani yê mezin ku 300 sal berî niha, qimcteke gelekî bilind dida xwendin û nwisandina zîmanê kurdi, sedemê nwisandina Nûbarê, di pêşgotina wê da weha nwisîye:

Ne ji bo sahib rewacan
Belki ji bo biçûkê Kurmancan

Weki ji Qur'anê xilas bin
Lazim e li sewadê çavnas bin


Wergera wê ji tipên erebî, bi destê Zeynclabidin Kaya hatiye amadekirin. Bi weşandina Nûbarê Weşanên Roja Nû berhemeke kurdi ya din ji bi tipên latîni û bi çapeke nû gihande xwendevanan.



Ehmedê Xani

NÛBAR





BERMAYĒN DĪROKI
LI ÇĪYAYE NEMRŪD